DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

# ŞEVÊN SPÎ

## Dostoyevskî

**Werger: Firat Ceweri**



NÛDEM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Weşanên NÛDEM: 1
*Şevên Spî*
Çapa Yekem 1993

© Weşanên Nûdem
Pergala berg û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê: P. A. Renoir, 1875
ISBN: 91-88592-00-6

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# DOSTOYEVSKÎ

(1821-1881)

Fyodor Dostoyevskî di sala 1821'ê de li Moskovayê tê dinyayê. Diya wî di salên xwe yên ciwan de wefat dike, bavê wî yê doktor, çikûs, zalim û dijwar jî di sala 1839'an de tê kuştin.

Zaroktiya Dostoyevskî li Moskovayê derbas dibe. Ew di 12 saliya xwe de dikeve dibistaneke rastîn. Lê di dema xwe ya dibistanê de gurekî xwendinê ye. Bi şev û roj dixwîne, ji ber xwendina xwe ya pir wext nabîne ku li dibistanê ji xwe re heval û hogiran çêbike. Hevalên wî yên herî baş pirtûkên wî ne. Ev yeka han heya mirina wî dom dike. Ew xwendina wî ya zêde dinya wî fireh dike, êdî bi awirekî din li der û dora xwe dinihêre, tiştên ku her kes nabîne, ew dibîne û ev yeka han wî di salên wî yên biçûk de dajo ser nivîskariyê.

*Dostoyevskî* di sala 1845'an de romana xwe ya pêşî bi navê *Mirovên Reben* dinivîsîne. Ew romana wî ji aliyê rexnegirên wê demê ve baş tê pesinandin. Di sala 1846'an de romana wî *Bercêwî* derdikeve. Paşê li dû hev *Bermalî* (1847) *Mîrza Prochartjin* (1846) *Dizê Rastgo Niyetoçka Nezvanova* (1849 ), *Qehremanekî Biçûk* ( 1849, lê di 1857'an de derket) û ev romana di destên we de, *Şevên Spî* (1848)

Lê di sala 1949'an de *Dostoyevskî* ji nişka ve ji aliyê leşkerên Çar ve tê girtin. *Dostoyevskî* zêde li hember girtina xwe dernakeve, lê tenê meraq dike bê ew ji bo çi hatiye girtin. Paşê tê gotin ku sedema girtina wî ew bû ku wî di civînekê de nameyên *Belînskî* yên qedexe ku ji *Gogol* re şandibûn, xwendiye. Gava piştî girtina îfadeyên wan, rojekê dibihîzin ku ew ê ji bo wî sûcî bêne gulebaranakirin, *Dostoyevskî* ecêbmayî dimîne û ji yê li kêleka xwe re dibêje: "Ma gelo bi



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

rastî sûcê me ewçend giran e, ku divê em ji bo wê bêne gulebarankirin?" Hîn wilo xeberek ji aliyê Çar ve tê şandin, ku dev ji îdama wan berdin. Lê ew berê *Dostoyevskî* didin Sîbîryayê, wî davêjin nava girtiyên mêrkuj, diz, narkoman û gelek tade û neheqiyan digihînin ê. Lê tiştê ecêb ew e, ku *Dostoyevskî* li wir ji mirovan bi dûr nakeve, gir û nefreta wî li hemberî mirovan çênabe, lê belê hezkirineke bêdawî ya mirovantiyê di dilê wî de çêdibe. Heta ew li hemberî Çarê ku ew mecbûrî wê jiyana zehmet kiribû jî, bi rehim dibe û evîna gelê Rûsyayê di dilê wî de pêl dide. Ev evîn û hezkirina wî ya li hemberî rûsan ewqas xurt dibe ku, ew carinan mîna şovenîstekî difikire.

Ew çend salên dirêj yên surgunê, çi bigire navê *Dostoyevskiyê* mezin li Rûsyayê dide jibîrkirin. Lê belê piştî ku ew tê berdan, ew bi tûrikê xwe yê tijî ruhuyetên kûr yên mirovatiyê, dîsan derdikeve pêş. Ew bêî rawestan û li dû hev romanên mîna *Xewna Apo* ( 1859 ), *Gundê Stepançîkova û Şêniyên wê* ( 1859 ), *Qumarbaz* ( 1866 ), *Gêjik* ( 1869 ), *Sûc û Ceza* ( 1866 ), *Birayên Karamazov* ( 1880 ) û gelek roman û nivîsarên din dinivîsîne. Ew *Dostoyevskiyê* ku hatibû jibîrkirin, dîsan li seranserî Rûsyayê navê wî tê bihîstin, dibe yek ji nivîskarên dema xwe û dema me yê herî mezin.

Lê *Dostoyevskî* mîna hin nivîskarên din yên dema xwe berhemên xwe ne di xweşiyê de dinivîsîne, ew berhemên xwe li surgunê, di feqîrî, perîşanî û belengaziyê de nivîsandine. Ew mirovekî nexweş, bi êş û azar bû. Ji ber vê yekê ye ku cîhana *Dostoyevskî* tije mirovên nexweş û reben in... Ew jî carna yek ji wan e, carna jî psîkoanalîtîkek e, dadikeve kûraniya ruhiyeta wan, cîhana wan ya zaroktiyê tev dide, li sedemên derd û problemên wan digere.

Çavkaniya *Dostoyevskî* mirovatî ye. Loma wî heta niha navê xwe parastiye, pirtûkên wî heta niha aktuel in, navê wî gerdûnî ye.

Armanca weşanxaneya me ew e ku bi wergerandin û weşandina vê berhema *Dostoyevskî*, zimanê kurdî bike xwediyê berhemeke nemir û pirtûkeke din li pirtûkxaneya kurdî ya jar zêde bike. Em hêvîdar in ku me ê karekî bi dilê we kiribe...

F. Ceweri



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Şeva Pêşî

*Qet nebe, ji bo kurtedemekê be jî, ma gelo*
*ji bo ku ew nêzîkî dilê te be hatiye afirandin?*
Ivan Turgenyev

Xwendevanê min yê delal, ew şeveke wilo xweş bû, ku mirov ancax dikare şevên wilo di xortaniya xwe de bibîne! Mirov li asmanê rohnî, li stêrkên bi şewq dinihêre û ji xwe re difikire, ku "di bin asmanekî wilo de mirov çawan dikarin hêrs bibin û biqeherin". Lê ev fikir jî ji bo xortan e, xwendevanê delal, hem jî ji bo xortên pir ciwan... Ez hêvîdar im, wê dilê we jî demeke dirêj ciwan bimîne.

Ji ber ku peyv ji mirovên bêhnteng û zirz vebûye, ne di destê min de ye, ku ez biaqiliya xwe ya wê rojê bi bîr neynim. Destê sibehê, aciziyeke ecêb, bêhntengiyeke mezin dilê min dagirtibû. Di dilê min de hîsek ku her kes dev ji min berdidin û min bi tenê dihêlin, çêbûbû. Bi gotina "herkes" heqê we heye ku hûn bipirsin. Ji ber ku ev nêzîkî heyşt salên min in, ez li Petersburgê dijîm, lê min hê jî ji xwe re nasek peyda nekiriye. Lê ma ez ê çi bikim ji nasan? Ji xwe ez Petersburgê ji serî heta binî nas dikim. Ji ber vê yekê, gava hemû rûniştevanên Petersburgê çûne havîngehên xwe, ez wilo fikirîm, ku wan dev ji min berdan û ez bi tenê hiştim. Gava ez bi tena serê xwe jî mam, tirseke mezin



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

kete dilê min, sê rojan weke dêhnan li min hatibû, ez her li kuçe û kolanên bajêr geriyam. Ez çûm kuçeya Neva, çûm parkê, çûm ber perê behrê, ez bi ku ve çûm jî, ew mirovên ku min di hundurê salekê de li eynî cihî didîtin, min vê carê yek ji wan jî nedît. Ew min nas nakin, lê ez wan hemûyan nas dikim, hem jî ez wan ji nêzîk ve nas dikim. Rûyê hemûyan jî niha li ber çavên min in. Dilşahiya wan dilşahiya min, xemgîniya wan xemgîniya min e. Her rojên Xwedê ez li Fontankayê pêrgî kaloyekî hûrik dibû. Hema wextî ez bi wî kalokî re bibûma dost. Kalo bi kincên xwe yên spehî û bi rêk û pêk, her tim destê xwe yê çepê li ba dikir û hêdî hêdî di ber xwe de dipeyivî. Di destê kalo yê rastê de jî gopalekî destikzêr û girêk girêkî heye. Mêrik êdî hebûna min ferq dike, her cara ku ew min dibîne, ew dixwaze xwe nêzîkî min bike.

Ez dikarim bi şert bileyizim, gava ew min li Fontankayê nebîne, kêfa wî lê dişikê. Ji ber vê yekê, her cara ku ez û ew pêrgî hevdu tên, ger kêfa me li cih be, em herdu jî dikevin hewayeke ku em ê silavê bidine hev. Wî çendê berê, me du rojan hevdu nedît, roja sisiyan gava em li hevdû rast hatin, tu nemabû ku me herduyan jî destê xwe biavêta şewqên xwe û silav bidaya hevdu. Lê baş bû ku tam di wê demê de hişê me hate serê me û me herduyan jî destê xwe berdan ber xwe û me bi tenê mîna berê li hevdu nihêrî û em di ber hevdu re derbas bûn.

Navbera min û xaniyan jî xweş e. Gava ez ji xwe re digerim, ew yek bi yek bi pencereyên xwe ve derdikevin pêşiya min, li min dinihêrin, hin ji wan jî ji min re dibêjin:" Merheba, tu çawa yî?" Eh, ê min şukur ji Xwedê re ez baş im, di meha gulanê de ew ê qatekî din jî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

li ser min lê bibe". Hinek ji wan jî "Ê tu çawa yî lo? Ê min ew ê sibehê min tamîr bikin", dibêjin. Hinek jî dibêjin: "Do hindik mabû ez bişewtiyama, ez wilo tirsiyam ku" û hwd... Ez ji hinan ji wan hez dikim, ez hinan ji wan jî ji nêzîk ve nas dikim, yek ji wan wê xwe havîna pêşiya me nîşanî mîmarekî bide. Gava ew tamîr bibe, Xwedê wî bisitirîne, ji bo tiştek bi serê wî de neyê, ez ê her roj herim wir. Hela ez çîroka xaniyekî xwe ê pembe qet ji bîr nakim.

Ew xaniyekî kevirî, biçûk, delal û xweşik bû; gava wî li cîranên xwe yên hepelorî dinihêrî, xwe dinepixand, lê gava li min dinihêrî, rû bi ken bû. Ji ber vê yekê xwîna min jî bi ser wî de dikeliya, ez pê dilgerm dibûm. Gava ez hefteya çûyî di ber wî re derbas bûbûm û min serê xwe bilind kiribû, min dengekî bi şewat " ez bi boyaxa zer boyax kirim" bihîstibû. Û ez çi bibînim, hey haydûtno, barbarno, ne stûn hiştibûn, ne jî banîje... Hemû jî bi rengekî zpîzer boyax kiribûn. Ez hêrs bûm, xwîna min kişiya mêjiyê min. Ji ber ku wan dostê min yê belengaz di rengê împeratoriya Çînê de boyax kiribûn û ew kirêt kiribûn; ew roj ev roj e ez naçim wê taxê.

Erê, xwendevanê min, tu dibînî bê ez çiqasî Petersburgê nas dikim.

Ji bo derxistina sedema wê min li jor behsa aciziya ku ev sê roj in hundurê min perçe kiriye, kir. Ez li kuçê aciz dibûm. "Ev tune, ew tune, ê din kî dizane bê çûye kîjan dojehê" min digot û min di hundurê xwe de xwe dixwar. Tam du şevan li ser hev, "ma çiyê min kêm e, ji bo çi ez li vir rehet nakim?" min digot û ez dikirî di odeya xwe de dêhn bibûma. Min bi awayekî ecêbmayî li dîwarê rengkesk, yên ku ji hundur ve reş bûbûn û li



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

tevnepîrikên ku bi jêhatîbûna Matiryonayê di zikê xênî de hatibûn çêkirin, nihêrî. Min got: "Ma gelo hemû aciziya min ji van e?" û min ew kursiyên wir jî di ber çav re derbas kirin.

(Ji ber ku te divê bila bi tenê kursiyek be jî, bê min êvarî ew çawan hiştibe, ez wilo nebînim, ez hêrs dibim). Min çavên xwe li pencereyê gerandin; lê hemû jî vala... Min qet nikarîbû bêhna xwe berda û xwe rehet bikira. Heta min bangî Matriyonayê kir, ji bo tevnepîrik û bêkêriya wê bêî ku ez zêde dilê wê bihêlim, min erza wê şikand. Piştî ku jinikê bi ecêbmayî li min nihêrî, derket û çû. Tevnepîrik hê jî spîsax li cihên xwe sekinî ne.

Dawî dawî, wê sibehê min rastiya çîrokê fêhm kir. Ya rastî her kesî dev ji min berdidan û diçûn havîngehên xwe. (Li min bibûrin ku ez li vir uslûbeke sivik bi kar tînim, ji ber ku niha ne wextê uslûba bilind e). Ji ber ku hemû rûniştevanên Petersburgê an çûbûn havîngehên xwe, an jî li ser rê bûn û diçûnê. Her kesên ku ez pêrgî wan dibûm, xwe dinepixandin, diketin hewayeke ecêb û digotin: " Em hema seriyekî hatine vir, lê piştî du saetên din em ê vegerin havîngehê". Ger keçikek xweşik, bi tilîkên xwe yên mîna berfê spî li pencerê bikira teqeteq û ji gulfiroşekê gurzek gul bikiriya, ew ne ji bo ku bêhna gulan û buharê têxe xaniyên bajêr yên bêhilm; lê ez difikirim, ku ew ê wan gulan jî bi xwe re bibin havîngehan. Ez bi vê jî nedihatim ser, lê bi vê dîtina xwe ya nuh min tiştên qenc bi dest xistin. Di awira pêşî de min fêhm dikir, bê ew di çi celeb havîngehan de diman. Yên ku li taxa Kemannî, giravên Aptekarskî, an jî li kolana Peterhovê diman, bi tenikî, bi kincên xwe yên sivik, bi



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

otomobîlên xwe yên spehî li ber çavên min diketin. Yên ku li Pargolovoyê û hîn jî jê wêdetir diman, bi awira pêşî, ew bi mirov mîna kesên biaqil dixuyan. Yên ku ji bo derbaskirina havîna xwe dihatin girava Krestovskiyê jî bi kêf û bi tevgerên xwe balkêş bûn.

Bi alavên malê yên wek çiyan, bi maseyan, bi dîwan û gelek hûr mûrên din ve, di ser wan de jî, piraniya caran jinên navmalî yên ji hevdeketî, li erebeyên bi bar, yên li dû hev siwar dibûn û ew firaxên maldarên xwe mîna bîbikên çavên xwe diparastin. Ger ez qeyikeke bi bar, di Neva re, ku heya girava diçe, bibînim, ew li ber çavên min pir dibin. Bi min wilo dihat ku her kes rabûne pê, dû re ketine tevgerê û bi koçmalî ber bi havîngehan ve diçin. Mirov digot qey wê hemû Petersburg vala bibe û di şûna wê de çoleke bêdeng bimîne. Gava min ew rewş wilo didît, ez bi xwe re hêrs dibûm, min fedî dikir û ez li ber xwe diketim. Yê min ne tu havîngeha min hebû, ne jî ji bo ku ez biçûma cihekî wilo tu sedem hebû. Hûn ya rastî bixwazin, ji bo ku ez bi her erebeyeke bi bar û bi her maldarekî ku faytonek kirê dikir re biçûma, min can diavêt.

Lê mixabin, yekî ji wan jî, erê, yekî ji wan jî bangî min nedikir. Te digot qey ez di quncika xwe de hatibûm jibîrkirin. Bi rastî jî ez ji bo her kesî biyanî bûm.

Ev e, ji ber vê yekê ez wilo pir geriyam. Dawî, weke her car min xwe ji bîr kir, bê ez li ku me û hew min lê nihêrî, ez li ber dergehê derveyî bajêr im. Di wê demê de kêfekê di dilê min de pêl da, ez bi gavên xurt meşiyam û derbasî derveyî bajêr bûm. Ez ber bi erdê çandî û mêrgan ve çûm. Êdî min tu westandin hîs nedikir û mîna ku barekî giran ji ser milê min rabûbe, ez sivik



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bûbûm. Rûyên kesên ku di ber min re diçûn û dihatin, bi ken bûn, hema hema wextî wan xwe daqûl bikirana û silav bidana min. Her kes bi tiştekî dilşa dibûn û puf pufa wan bûn cigarên xwe dikişandin. Ez jî pir bi kêf bûm. Ez heya niha wilo kêfxweş nebûbûm. Ji nişka ve mîna ez li Îtalyayê bim û mîna bajariyekî bi nîvruhê nexweş di nav komên keviran de gêjbûyî, min bi heyranî li mêrgan temaşe dikir.

Bi hatina buharê re, ew diyariya ku ji aliyê Xwedê ve tê û pê hemû cih û deverên mêrgên Petersburgê xweş dibin û dixemilin, tiştin tesîrê li mirov dikin, lê mirov bi xwe bi wan tiştan nahese. Mêrgên Petersburgê carinan jê mîna keçikeke jar û nexweş, carinan jî ji nişka ve dibe mîna keçikeke ciwan û bêhawe xweşik. Helbet hûn li hemberî vê keçikê ecêbmayî mane û we xwe winda kiriye.

Bêî ku di destê we de be, hûn dibêjin: "Kîjan hêzê ronahî daye wan çavên ûfbûyî û bifikir? Kê ev hînbûyên daye xetên nerm yên vî rûyî? Ev sîngên nû ji bo çi evqasî hildikşin û dadikevin? Ya ku bi carekê ve şêrîntiyê, spehîtiyê, jîndariyê dide vê keçika rûçilmisî çi ye? Kê ev ken daniye ser rûyê wê? Ev kenê jîndar yê bi pîqe pîq kê daye vê keçikê?" hûn ê ji xwe bipirsin. Hûn ê çavên xwe, li dora xwe, li hinan bigerînin û hûn ê ji nişka ve fêrî her tiştî bibin. Lê wê ew kurtedem zû derbas bibe. Dibe ku dotira rojê hûn dîsan eynî wê bi wan awirên melûl, bi rûyê çilmisî, bi tevgerên reben, bi ûfbûyin, bi poşmaniya wê ya jiyana berê, bi belengaziya wê, pêrgî wê bibin. Hûn li vê spehîtiya ku bi carekê ve tê û diçe, difikirin û ev yeka han dilê we disoje. Ji ber ku berî hûn bigihîjin ji vê spehîtiya xapînok û bê kêr hez bikin, ew bi niyeta ku hew vegere, winda dibe.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Hûn gelekî li ber dikevin û ji ber wê dil û cegerên we dişewitin...

Şeva wê rojê ji roja wê xweştir derbas bû. Ez ji çolê gelekî dereng vegeriyabûm bajêr, saet li dor dehan min nêzîkî li mal kiribû. Riya mala min di ber çem re derbas dibû.

Di vê saeta dereng de, li vir cin û pîrhebok bi gogê dileyizin. Ez çi derewan bikim, ez li taxeke dûrî bajêr rûdinim. Gava ez dimeşiyam jî min ji xwe re stranek digot.

Her gava ez dilşa bim, ez wilo ji xwe re stranekê dibêjim. Her kesên bê dost û heval, gava dilşa bin û nikaribin dilşabûna xwe bi hinin din re par ve bikin, ma ne wilo dikin?

Ji nişka ve tiştekî ku ez qet ne li bendî bûm, derkete pêşberî min. Jinekê xwe li ser pirê spartibû hesinê pirê. Wê enîşkên xwe danîbûn ser hesinê pirê û li ava çem ya girikî temaşe dikir. Mantoyekî reş mîna yê xanimqehpikan lê bû û şewqeyekî xweşik jî li serî bû. Min di dilê xwe de got: " Ji sedî sed ew keçik esmer e". Wê dengê teperepa lingên min nebihîstibû. Digel ku min bêhna xwe girtibû û gumguma dilê min bû jî, dîsan wê li min nenihêrî. Berî ku ez bibêjim "ecêb, ew çiqas li avê xayiz bûye" dengê îskîna giriyê wê hate min û ez di cihê xwe de sar mam. Erê ez ne şaş bûm, keçik digiriya. Ew her bi îskîn digiriya. Mîna tu bizoteke agir deyne ser dilê min, dilê min bi wê şewitî. Min got:" Ooy Xwedêyo!" ez herçiqas li hemberî jinan bi tirs bûm jî, lê ev yeka han rewşeke pir cihê bû. Hema ez nêzîkî wê bûm da ku bibêjim " Xanima hêja!" lê hate bîra min, ku bi hezaran car ev gotin di romanên ku behsa sosyeteya rûsan ya bilind dike de heye, loma min tişt negot û ez



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bêdeng mam. Di wê navê de ez li gotina ku min ê ji wê re bigota, digeriyam. Bêhna keçikê jî hebekî fireh dibû, wê li der û dora xwe mêze kir, serê xwe xiste ber xwe, di ber min re derbas bû û çû. Hema min jî da dû wê. Ez bawer im wê dê ew yeka han ferq kiribe, loma ew derbasî aliyê din yê rê bû. Hûn ya rastî bixwazin, ez qet nefikirîbûm ku derbasî aliyê din yê rê bibim. Dilê min ji heyecanê mîna dilê çivîkeke biçûk lêdixist. Lê di wê navê de bûyerek hate alîkariya min. Li aliyê din ê rê, li dû jinikê, mêrikekî pak ku frak lê bû, xuya bû. Lê rêveçûna mêrik qet ne bi rêk û pêk bû; wî çarê xwe dispart dîwêr, dihejiya û bi dû jinikê de dimeşiya. Mîna hemû jinên ku bi şevan ji mêrên nenas yên ku dest diavêjin jinan ditirsin, ew jî bi wê tirsê, wek tîra ji kevên derkeve, ji ber mêrik direviya. Ger şansa min alîkariya min nekira jî, mêrikê serxweş û cangiran, hin herekêtên xurt nekira, ez qet nedigihîştim keçikê. Keçik weke bahozê diçû. Mêrikê ku bi zorê li ser lingên xwe radiwestiya, nedixwest dev ji keçikê berde. Wî nêzîkî li keçikê kiribû, tu nemabû ku bigihiştayê, keçikê kire qîrîn. Xwedê kir gava ez derketibûm, min gopalê xwe yê girêk girêkî bi xwe re biribû. Hew min dît ku ez li ba wan im; wê mêrikê belaxwaz ferq kiribe ku wê çi bête serê wî, loma bêî ku gotinekê jî bibêje, bela xwe ji keçikê vekir û li dû me ma. Piştî ku em hebekî meşiyan, mêrik li dû me gotinin ne xweş û ne li rê gotin, lê em ji hev bi dûr ketibûn, dengê wî baş nedihate me.

Min ji jinikê re got:

- Têkeve milê min, êdî ew nema dikare were aliyê me.

Wê milê xwe yê ku ji tirs û heyecanê diricifî, dirêjî min kir. Hoo mêrikê belaxwaz, min di wê deqîqeyê de



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ji te re çiqasî dia bikira jî dîsan hindik bû. Min wa hêdî li keçikê mêze kir, min dît ku ew esmereke xweşik e. Nizanim gelo, ne ji ber tirsa berî niha bi kêlîkekê bû, ne jî ji ber liberketina wê ya berê bû, hê jî hêsirên wê li ser lêvên wê belav dibû. Wê jî awirek da min, lê dû re şerm kir û serê xwe bera ber xwe da.

- Te bîstika din guh neda min, te dît bê çi hate serê te? Ger ez bîstika din li ba te bûma, ev tiştên han nedihatin serê te

- Lê ez te nas nakim ku... Min got belkî tu jî yek ji wan î.

- Baş e, ma tu niha min nas dikî?

- Hindikî... Çîk, tu diricifî, ma ji bo çi?

Digel xweşikbûna keçikê, biaqiliya wê jî kêfa min anîbû.

- Wilo ha, te bi awirê pêşî ferq kiribû? Erê, te niha fêhm kir, bê tu li ba kê yî? Ez li hemberî jinan şermokî me, bi heyecan im û bi qasî tu ji wî peyayî tirsiyayî, ez jî ji jinan ditirsim. Hê jî şerma min neçûye. Tu dibêjî qey ez di xewnekê de me. Ger ez di xewna xwe de jî bibînim ku bi jinekê re dipeyivim, ez ê dîsan bawer nekim.

- Çawa, tu çi dibêjî?...

- Erê, wilo ye. Sedema ricifandina destê min ew e, ku heya niha destekî mîna destê te neketiyê. Ez ji jinan baş bi dûr ketibûm. Tu a rastî bixwazî, ez qet hînî jinan nebûme. Ez peyayekî bi tenê me... Ez nizanim bê mirov çilo bi we, jinan re dipeyive. Ez niha jî nizanim. Hêvîdar im ez niha bi te re mîna ehmaqan napeyivim. Ger wilo be venekişe, bibêje. Metirse, ez ji te naxeyidim...

- Na, ez di peyva te de tu tewşiyan nabînim; bereva-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

jiya wê, tu gelekî xweş dipeyivî. Tu a rastî bixwazî, jin ji mêrên hebekî şermokî bêtir hez dikin. Ez dixwazim û destûra te didim, ku tu bi min re werî heya mala min.

Ji kêfan kirî bêhna min biçikiya:

- Tiştê ku tête fêhm kirin tu ê bi vî awayî misqala tirsê bi min re nehêlî. Wê çaxê jî ez ê xêtir ji hemû çareyên xwe bixwazim.

- Çareyên te? Çi çare? A ev yeka han pir xerab e!

- Bibûre, ji devê min derket. Lê, tu ê niha çawa daxwaza tiştekî ku ez naxwazim, bikî?

- Daxwaza ecibandinê?

- Erê, hewl bide min fêhm bike, ka bê ez miroveki çilo me. Tu nemaye ez têkevim bîst û şeş saliya xwe, lê ez hê jî neketime nava mirovan. Gava rewş wilo be, ez ê çawa bikaribim xweş bipeyivim û gotinên xwe di cih de bi kar bînim.

A baş ew e, mirov her tiştî weke ku heye bibêje. Gava dilê min bipeyive, ez nikarim bêdeng bimînim... Guh mediyê, ne girîng e... Tu bawer dikî ku ez hê bi jinekê re nebûme dost? Erê, ne bi jinekê re jî... Ez her tim xeyala ku ez ê rojekê jinekê nas bikim di serê xwe de çêdikim. Ma tu dizanî bê ez çend caran bi vî awayî dildar bûme?

- Çawa wilo çêdibe, dilê te dikeve kê?

- Dilê min nakeve kesî... Dilê min dikeve wê jina ku di bîra min de ye û rûyê wê yê ku di xeyala min de ye. Ez di xeyalên xwe de romanan diafirînim. Ax, tu min nas nakî! Niha tu dibêjî ger ev jinan nas neke, çênabe, lê tu nizanî bê ez çi celeb jinan nas dikim. Hemû jinên ku ez nas dikim çend kevaniyên malan in. Hem jî ez li hinin wilo rast hatime ku... Ger ez tiştekî ji te re bibêjim tu ê bi min bikenî. Çend caran min dil kir ku ez li kuçê bi xanimjinekê re bipeyivim. Ew peyva min ya bi wê re



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

wê sade, bi şermokî, bi giramgirî û hundursotî bibûya. Min ê jê re bigota, ez heya niha bi jinekê re jî nebûme heval. Ji ber vê yekê jî min ê jê rica bikira, ku gava ez pê re dipeyivim, ew min neqewirîne. Û min ê jê re bigota, bi paşdevegerandina xwesteka mirovekî nola min, bi xatûneke mîna wê nakeve. Wê hemû daxwaza min ji wê ew bûya, ku ew tenê mîna xwişkekê du gotinên xweş bi min re bike. Erê, bi tenê du gotinên xweş... Min ê jî bixwesta ku gava ez devê xwe vekim, ew min neqewirîne, bi bawerî li gotinên min guhdarî bike, ger ew bixwaze, ew dikare bi gotinên min bikene jî. Lê tenê ew bersiva min bide, tenê du gotinan ji min re bike, bi tenê du gotinan û jê pê ve jî min ê jê re bigota, êdî em ê hew hevdu bibînin. Binêr, tu dikenî...

Ji xwe ez jî ji bo vê yekê ji te re behs dikim...

- Ji min mexeyide, lê ji bo ku tu dijminê xwe yî ez dikenim. Ger te biceribanda, te ê bikarîbûya li kuçê bi jinekê re bibûya dost. Jin ji sadebûnê hez dikin. Ger ne jinin ehmeq bin û ji tiştinan gelekî aciz nebûbin, wê her jin bixwaze bi kêfxweşî bi te re çend gotinan bipeyive. Tu dîsan jî guh mede gotinên min. Kî dizane, belkî ew dikarin bibêjin ku tu dêhn e jî. Min berî niha bi kêlîkekê ji te re fikra xwe gotibû. Ji ber ku ez bi jiyana mirovan dizanim, min pir tişt dîtine, pir tişt bi serê min de hatine...

- Oo, gelek spas! Tu dizanî bê te niha ji bo min çi qencî kir...

- Baş e, wê çaxê bibêje, ê min... Ez çilo bibêjim, te ji ku fêhm kir, ku ez keçikeke hêjayî dostaniyê û qîmet im? Ji bo çi te biryar da ku tu nêzîkî min bibî?

- Ji bo çi? Ji ber tu bi tenê bûyî, ew mêrikê ha jî rehet nedisekinî, ew çavsorî bûbû û şev bû. Vê yeka han mîna



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

wezîfeyekê qebûl bike.

- Lê na, berê, li aliyê din yê rê ... Te hê li wir xwestibû tu xwe nêzîkî min bikî, ma ne wilo ye?

- Li wir, li hember? Bi rastî nizanim ez ê çilo bersiv bidim. Ez ditirsim... Ma tu dizanî ku ez îro pir dilşa me. Ez qet nesekinîm, ez her geriyam, min ji xwe re stran gotin. Ez derketim derveyî bajêr, çûme nava erdan. Bi qasî ku ez di van deqîqeyan de dilşa me, ez tu caran dilşa nebûme. Tu... Lê dibe ku ji min re wilo hat... Bibuhure ku ez tînim bîra te, lê weke ku min dengê giriyekî bihîstibû. Heçê ez im... Min debar nekir... Dilê min êşiya... Ay, Xwedêyo! Ma gelo min nêzîkahiyek li hemberî te hîs nekiribe? Gelo min sûcek kir, ku dilê min weke yê birayekî te bi te şewitî be? Bibuhure ku ez dibêjim, dilê min bi te şewitî... Neyse, ji bo ku ne di destê min de bû ku ez nêzîkî te bibim, ma gelo te dilê xwe ji min girt?

Keçika ciwan çavên xwe bera erdê dan û destê min guvaşt.

- Bes e êdî, dev ji van tiştan berde, got. Ji bo ku min peyv anî ser vê mijarê ez sûcdar im, lê ji ber ku ez di derheqa te de şaş nefikirî me, ez xwe serbilind hîs dikim...

Eh, va ye em gihîştin malê. Ez ê di vir de têkevim vê kuçeya tengik. Mala min li vê nêzîkê ye... Di xweşiyê de bimîne. Spas dikim...

- Ma em ê êdî hew hevdu bibînin? Ma wê her tişt wilo dawî were?

Keçik keniya:

- Tu dibînî, te pêşî du gotin dixwest, tu niha jî... Jê pê ve ez hew tiştekî dibêjim. Dibe ku em careke din jî hevdu bibînin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Ez ê sibehê werime vir. Bibuhure ku ez vê ji te dixwazim.

- Tu pir bêsebir î. Di ser re jî tu wextî emir bikî...

Min peyva wê birî:

- Deqîqeyekê raweste, li min bibuhure, dibe ku ez dîsan tiştekî ecêb ji devê xwe birevînim... Tiştê ku ez dixwazim bibêjim ev e, ger ez sibehê neyême vir, ez îdare nakim. Ez xeyalperestek im. Di jiyana min de bûyerên ku dibin wilo hindik in, ku ev deqîqeyên me bi hevdu re derbas kirin, pir kêm bi serê min de tên. Loma ez gelek caran bûyerên wilo di xeyala xwe de didime jiyandin. Ez ê sibehê werime vir. Ez ê te hemû şevê, hefteyekê, salekê xeyal bikim. Ez ê sibehê werime vir. Ez ê sibehê tam di vê saetê de werime vir. Gava ez hevdudîtina me ya îro bi bîr bînim, ez ê xwe dilşa hîs bikim. Du-sê cihên min yên wilo li Petersburgê hene. Carekê, min rojên xwe yên buhurî bi bîr anîbûn û ez jî weke te giriyabûm. Kî dizane, dibe ku tu jî berî niha bi deh deqîqeyan ji ber bîranîneke wilo digiriyayî.... bibuhure, min dîsan xwe ji bîr kir. Dibe ku jî tu demekê li vir deqîqene dilşa jiya be.

- Baş e, belkî ez sibehê saet di dehan de werim. Ez çi bikim, ji destê min nayê ku ez te bişikînim. Divê ez sibehê li vir bim. Nebe nebe, tu nefikîrî ku min ji bo hevdudîtinê wext daye te. Hatina vir ji bo şexsê min pêwîst e. Wê çaxê ez dikarim bibêjim, ku di hatina te de jî tu nelirêtî tune ye. Dibe ku sibehê jî bûyereke mîna ya îro nexweş çêbibe, neyse, tu wê hesab meke... Xwestina min ev e; Ji bo ku ez çend gotinan bi te re bipeyivim, ez dixwazim te bibînim. Lê ez hêvîdar im, tu ê di derheqa min de tiştekî xerab nefikirî. Vê jî bizanibe, ez wilo bi her kesî re hevdu nabînim... Min bi te re jî wext vene-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

diqetand, ger... neyse... ez vê sira xwe eşkere nakim! Tenê şertekî min heye.

Ez bi kêf qîriyam:

- Te got, şertekî te heye! Ez bi hemûyî, bi hemûyî razî me. Ez amade me ku her tiştên tu bixwazî, bikim. Ez ji te re soz didim ku ez ê li hemberî te bi hurmet bim, her tiştê ku tu bixwazî ez ê bikim...

Êdî tu min nas nakî.

Keçik dikeniya.

- Ev e, ji ber ku ez te nas nakim, ez ê sibehê te biezimînim vir. Ez te pir baş nas dikim. Ez dîsan di bîra te de tînim, tu şertê min ji bîr nekî. Çi dibe, tu niha tiştên ez dixwazim, bike, ez ji dil dibêjim; dil nekeve min. Bawer bike ev ne mumkun e. Lê ez ji dostaniyê re hazir im, va ye destê xwe dirêjî te dikim. Lê hezkirin nabe, qet nabe!

Min bi destê keçikê yê biçûk girt.

- Ez sond dixwim.

- Ne hewce ye ku tu sond bixwî. Ez dizanim tu ê wekî barûdê biteqî. Tu ji bo van gotinên han li qusûra min nenihêre. Ax, ku te bizanîbûya bê ez çiqasî bi tenê me. Ne kesekî min yê ku ez çend gotinan pê re bipeyivim heye, ne jî kesekî ez pê bişêwirim... Ez nikarim li kuçeyan jî ji xwe re li hevalan bigerim. Lê tu cihê yî, tu dibêjî qey ev bîst sal in em hevalên hevdu ne... Tu ê li ser soza xwe bimînî, ne wilo?

- Ma tu ê bimînî? Lê ez ê çawan dawiya vê zirecêba rojê bînim!

- Xweş binive û vê jî bizanibe ku ez baweriya xwe bi te tînim. Şev baş! Kêfa min gelekî ji peyva te ya gava din re hat: Mirov ne hewceye ku hesabê her daxwaza xwe bide.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Tu dizanî, gava te ev gotin, ez tavilê têgihîştim ku ez dikarim baweriya xwe bi te bînim...

- Ji kîjan alî ve? Çi dibe, bibêje!

- De, di xweşiyê de bimîne. Bila ev mijar niha veşirtî bimîne. Wilo ji bo te çêtir e, dişibe romanê... Dibe ku ez wê yeka han sibehê bibêjim, dibe ku jî ez eşkere nekim. Ez pêşî dixwazim bi te re bipeyivim, te baş nas bikim.

- Ez ê sibehê ji te re behsa xwe bikim. Çi ecêb e! Mîna ku ez di hundurê mucîzeyekê de me... Xwedêyo, ez nizanim bê li ku me. Ma gelo ji bo ku te mîna jinên din nekir û ez ji ba xwe neqewirandim, tu ji xwe hêrs dibî?Ji min re rast bibêje! Te ez di du deqîqeyan de kirim mirovekî dilşa. Erê, mirovekî ku heya li dinyayê be, wê dilşa be. Belkî te kir ku ez bi xwe re li hev bêm.Te hemû şikên min rohnî kirin. Demên min ên wilo çêbûne ku... Guh mediyê, ez ê sibehê ji te re behs bikim. Tu ê sibehê ji min tiştekî nû bibihîzî.

- Baş e, min qebûl e, tu ê berê dest pê bikî.

- Di xweşiyê de bimîne!

- Oxir be!

Em ji hevdu veqetiyan. Ez hemû şevê geriyam. Min qet nikarîbû biryara çûyina malê bidaya. Ez pir dilşa bûm. Ox, me ê sibehê hevdu bidîta...



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Şeva Duyemîn

Keçika ku bi ken herdu destên min guvaştin,

- Ez dibînim te roja xwe nebiriye serî, got.

- Ev du saetên min in, ez li vir im, tu nizanî bê hemû rojê çi qewimî ye.

- Ez dizanim, ez dizanim...Neyse, em vegerin ser mijara xwe. Ka tê derxe bê ez bi çi armancê hatime vir! Êdî mîna do zimandirêjî tuneye. Ji niha û pê ve divê em aqilê xwe bidin serê xwe. Ez dûr û dirêj li bûyerên do fikirîm.

- Em ê bi çi celebî aqilê xwe bidin serê xwe? Ez bi xwe ji vê yekê re hazir im; lê ez dixwazim vê jî rohnî bikim, ku ez tu caran mîna niha biaqil nebûme.

- Dibe, a yekê ez ji te rice dikim, tu destê min ewqasî neşidîne. A dudan, ez îro pir li te fikirî me.

- Paşê?

- Paşê jî divê em her tiştî ji nû ve dest pê bikin. Ji ber ku min îro biryar daye ku ez ê te baş nas bikim. Ez li hemberî te mîna keçikeke zarok, bi xamî tevgeriya me. Ez dikarim dawî vê bibêjim, ku sedema van hemûyan tenikiya dilê min e. Wek her tim, gava mirov



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

pirsên xwe çareser dike, mirov xwe dipesinîne, niha jî hemû sûc ji xwepesindayina min e. Ji ber vê yekê, ji bo ku ez bikaribim şaşiya xwe rast bikim, divê ez te pir baş nas bikim. Ez naxwazim di derheqa te de ji kesî din bipirsim. Ez dixwazim tu ji min re behsa xwe bikî. Ez dixwazim tu xwe bi min bidî naskirin. De, fermo behsa xwe bike. Ez dixwazim zû fêrî çîroka jiyana te bibim.

- Çîroka jiyana min? ez bi tirs qîriyam. Kê ji te re got, ku çîrokeke jiyana min heye. Tiştekî min î wilo tune ye...

Keçikê bi ken peyva min birî:

- Ger çîrokeke jiyana te tune be, tu çawan dijî?

- Ma çiyê hêjayî behsê di jiyana min de heye? Ez heta niha bi tenê û ji xwe re jiya me. Erê, bi tenê, bi tikî tenê... Gelo tu dizanî bê "tenêtî" çi ye?

- Çawa tenê? Yanî bêî ku tu kesî bibînî, tu jiyayî?

- Na, ne wilo. A dîtinê ez dibînim, lê ez dîsan jî bi tenê me.

- Qey tu dixwazî bibêjî ku tu bi kesî re napeyivî?

- Erê, tiştekî wilo.

- Wê çaxê tu mirovekî çilo yî, de ka behsa xwe bike. Haa, raweste, min fêhm kir, yê te jî mîna min pîrikeke te heye. Pîrika min kor e. Min xwe dîtiye nedîtiye kirasê wê di destê min de ye, ez wextî peyvê jî ji bîr bikim. Min berî niha bi du salan şûmiyek kiribû, loma wê kurtekirasê min bi yê xwe ve derzî kiribû, em hîç nikarîbûn ji hevdu biqetiyana. Ew rûdinişt û wê bi wê korbûna xwe gore çêdikirin. Min jî an dirûn dikir, an jî bi dengê bilind jê re pirtûk dixwend. Ev e, şiklê jiyana min wilo ye. Ev du sal in, kirasê min bi yê wê ve derzîkirî ye û ez li ba wê rûdinêm...

- Eman, Xwedê bisitirîne! Çi bêşansiyeke mezin e! Lê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ê min pîrikeke min ya wilo nîn e.

- Ger pîrikeke te ya wilo nîn be, wê çaxê tu ji bo çi li malê rûdinê?

- Guh bide min, ma tu dixwazî bibihîzî bê ez zilamekî çilo me?

- Erê, ez dixwazim...

- Hem jî bi her awayî?

- Erê, bi her awayî!

- Baş e, wê çaxê ez tîpek im.

Te digot qey ev salek e, keçika ciwan nekeniyabû; ew bi hîke hîk keniya.

- Tîp, çi tîp? Bi Xwedê tu mirov ji ken diteqînî! Binihêre, wa ye li wir şûneke vala heye, heydê em herin li wir rûnên. Kes di vir re naçin û nayên, wê dengê me neçe kesî. De, berî ku dereng bibe tu behsa çîroka xwe bike! Tu çi dibêjî bibêje, lê tu nikarî bi min bidî bawer kirin, ku çîrokeke jiyana te nîn e. Tu tiştinan ji min vedişêrî. Ka tu pêşî behsa "tîp" î ji min re bike, bê ew çi ye.

Ez jî bi kenê wê yê zaroktî re keniyam.

- Ma te got, tîp. Tîp ew e ku ji her kesî cûda ye û ecêb e. Hêlên wî yên ku naşibin yên kesî hene. Gelo ma tu bi maneya xeyalperestiyê dizanî?

- Xeyalperestî? Ez çawan bi maneya wê nizanim! Ez bi xwe xeyalperest im. Gava ez li ba pîrika xwe rûdinêm, ma çi nayê bîra min!... Gava ez xeyal dikim, ez wilo ji xwe diharim, ez carinan bi lawê padîşahê Periyan re dizewicim. Xeyalkirin carinan jî tiştekî pir baş e.

Rûyê keçikê bi carekê ve ziwa bû:

- Lê ne her tim, got. Ger tiştekî ku mirov lê bifikire hebe, xeyalkirin xweş e.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Pir baş e! Ger tu xeyala zewaca bi lawê Padîşahê Periyan re çêdikî, tê wê maneyê ku tu ê wê çaxê min baş fêhm bikî. Ka raweste, ez hê navê te nizanim.

- Dawî dawî hişê te hate serê te. Ma ne hebekî dereng e?

- Ax, bibuhure, ez wilo dilşa me, ku nehat bîra min ez navê te bipirsim.

- Navê min Nastenka ye.

- Bi tenê Nastenka?

- Erê, ma bi te hindik hat, tu jî çi mirovekî birçî yî!

- Ma te got, hindik e? Pir e jî!

Hê te di hevdudîtina me ya pêşî de xwestibû ez ji te re bibêjim, Nastenka, loma ez bawer im, tu keçikeke dilpak î.

- Ez wilo me! Eh, tu behs bike.

- Baş e, Nastenka, ez ê niha ji te re behsa çîroka xwe ya qirdikî bikim.

Ez li ba wê rûniştim, bi cidî, mîna zaneyekî ku ji pirtûkê bixwîne, min dest pê kir û behsa xwe kir:

- Dibe ku tu pê nizanibî Nastenka, li Petersburgê, li taxa ku ez lê rûdinêm, tiştên ecêb hene. Ew roja ku hemû Petersburgê rohnî dike, li wir cihê ye. Tu dibêjî, qey ew roj xusûsî ji bo wir hatiye afirandin, pir guherî ye, dikeve şiklekî din. Wekî din, bi şewqeke taybetî wan deran rohnî dike. Ev e, li xewlecihên wilo jiyan jî guherî ye, xanima hêja, Nastenka! Qet naşibe wê jiyana ku li der û dora te dikele. Ev ji jiyana sergiran ya dema me cuda ye, lê mîna celebekî ku ji çîrokan hatiye bihîstin e. Bi tevliheviyek xeyalên rijî û îdealên germ e. (Mixabin Nastenka, zimanê min nagere, ez bibêjim bêhawe sernewq e), ev jiyana ku ez ji te re qal dikim, jiyaneke bêreng, kevin û adî ye.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Xwedêyo, ev çilo destpêk e! Em binêrin, bê hîn çi bibihîzin?

- Tu ê gelek tiştan bibihîzî, Nastenka. (Bi min wilo dixuye, ku ez ê bi gotina Nastenaka qet newestim). Ev e, li van quncikan tîpemirov û xeyalperest dijîn. Ger em xeyalperestekî baştirîn bidin naskirin, em dikarin jê re bibêjin, benderuhekî bêcinsiyet. Xeyalperest bi piranî li xewlecihan dijîn; li xewlecihên ku hê lingên mirovan pê neketine. Tu dibêjî qey ew ji şewqa tavê direvin. Ew mîna şeytanokan xwe dikişînin qulên xwe. A rastî ew heywanên mîna kûsiyan ku malên xwe bar dikin, tînin bîra mirov. Belkî hûn meraq dikin, bê çima ev zilam ji van çar dîwarên xwe ewqas hez dike? Hem jî dîwarên ji sedî sed bi rengê kesk boyaxkirî, ji dixana cigaran reşbûyî, mekroh û aciziyê dide mirov... Ji xwe nas û dostên wî pir hindik in. Gava yek ji wan were seredana wî, ew reş û zer dibe, bi dest û lingên li hev geriyayî pêrgî wî tê. (Dawî dawî, dostên wî hêdî jê bi dûr dikevin). Ew di nava çar dîwaran de dikeve rewşeke mîna ku wî sûcek kiribe. Tu dibêjî qey wî ji kovarekê re nameyeke bê îmze şandiye û bi nameya xwe re jî helbestên xwe şandine, lê di nameyê de daye xuyakirin, ku ew helbest ne yên wî ne, lê yên hevalekî wî ne; hevalê wî mirî ye, wî weşandina helbestên hevalê xwe ji xwe re mîna deynekî zanîbûye. Nastenka, ji bo çi mirovên tîp bi dostên xwe re rûnanên û ji xwe re nakevin sohbeteke xweş û germ? Ji bo çi bi dostên xwe re yê ku bi ketina hundur re kêfa wî lê dişikê, nakene, du gotinên bi heyecan ji dev dernakeve? An na ger li cihin din be, ew dikene, kêf dike, bi heyecan dipeyive, behsa jinan dike. Di nêzîk de ev dostê ku wê bê naskirin, ew jî çima hê di seredana pêşî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

de -ji ber ku wê seredana duda çênebe, wê careke din gava xwe neavêje vî hundurî. Ji rûyê mazûbên yê ji hevdeketî ecêbmayî dimîne. Ger ew heneker be, henekên wî di qirika wî de dicemidin û dimînin, xwe şaş dike. Ez vê rewşê azad bikim, peyvên jîndar bikim, ez jêhatîbûna xwe didim nîşandan û tiştên ku ez di derheqa jinan de dizanim, jê re qal bikim. Ez li hember dostê xwe yê ku riya xwe şaş kiriye û hatiye seredana min; hebekî şên bixuyim". Bi vî awayî ew ê xwe gelekî bide dest. Çi mêvandarî, ji bo sedemeke bêbingeh, mîna ku karekî wî yê gelek girîng derketibe, ew dest diavêje şewqê xwe, bi carekê ve radibe ser lingan; poşmaniya xwe dide nîşandan, ji bo ku ji ber şaşiyên ku kirine ji guvaştina dest rizgar bibe, ew xwe diavêje derve. Ji bo çi gava ev dostê han di derî re gava xwe diavêje der, bi pîrqîn dikene û sond dixwe ku ew ê careke din neçe seredana vî hevalê xwe yê bi rastî qenc, lê ecêb. Ji aliyekî ve jî çima ew şiklê rûyê wî mêrikê ew berî bi kurtedemekê pê re peyivî bû, digel ku tu têkiliyên wan bi hev re tune ye jî, dişibe rûyê çêlikeke pisîkan ya belengaz, ku lêdan xwariye û mîna wê rebena çêlika ku ji destên zarokên ku tade, lêxistin û eziyet lêkirrine, difilitîne, di tariyê de baz dide bin kursiyekê, êdî di binê kursiyê de heta ku bixwaze wê pirça xwe gij bike, neynûkên xwe nîşan bide û wê bi (patileriyle) wî rûyê xwe yê ku ji şerman reng diguherîne, bişo. Piştî wê jî ew ê demeke dirêj ji xwezayê, ji benderuhan, heta ew ê ji wê xwarina ku bermalî didiyê jî nefret bike, bi çavekî dijminahî lê binihêre.

Nastenkaya ku devê wê bostekê vebûbû, çavên wê beloq bûbûn û bi ecêbmayî li min guhdarî dikir, gava ez hatim vir, peyva min birrî.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Deqîqeyekê, ez bi sedema van tiştên ku tu ji min re behs dikî, nizanim. Herweha ez sedema wan pirsên te yên ecêb ku tu ji min re behs dikî jî nizanim.

Tiştekî ez fêhm bikim hebe jî, ew e ku ev tiştên tu behs dikin, hemû di serê te de derbas bûne.

Rûyê min bi cidîyeteke xurt ve tijî bûbû:

- Bêşik wilo ye, min got.

- Baş e, wê çaxê tu çîroka xwe bidomîne. Ez pir meraq dikim, bê wê çîroka te çawa dawî were.

- Nastenka, gelo ma tu dixwazî bizanibî bê gernasê me, ya rastî, min xwe çawan kişandiye quncikekê û ez bi xeyalên xwe re çi difikirim? Ma tu dixwazî bizanibî bê li hember seredana dostekî min, a ji nişka ve çima serê min tevlihev dibe. Tu dixwazî bibihîzî, bê gava deriyê min vedibe, ez çawa sor dibim û dest û lingên min çawa li hev digerin, ji ber ku ez ê nikaribim mêvên vehewînim, ez bi hîsên mêvanperweriyê dikevim binê erdê. Bibêje...

- Erê, erê! Tiştê ez dixwazim fêr bibim ev e. Binêr, tu çîroka xwe gelekî xweş dibêjî, gelo tu nikarî hebekî nexweştir behs bikî. Mirov dibêje qey tu ji pirtûkê dixwînî...

Ji bo ku ez nekenim min bi zorê xwe digirt, min bi dengekî berz û serbilind got:

- Nastenka, Nastenkaya delal, ez jî dizanim ku ez xweş behsa çîroka xwe dikim. Lê bibuhure, ez nikarim bi celebekî din behs bikim.

Tu dibêjî qey ez ruhê Hezretî Silêman yê ku hezar salî di binê kûpekî de bi heft mohran devgirtî mabe û paşê mohrên wî vebûbin û azad bûbe, hildigirim. Di dilê min de hîseke wilo heye.

Piştî jihevveqetandineke dirêj, gava ez gihîştim te (



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ji ber ku ez te ji mêj ve nas dikim, Nastenka, ji ber ku ez bi salan li yeka mîna te digeriyam. Ewa ku ez lê digeriyam tu bûyî. Pêrgîhevhatina me li eniya me nivîsandiye), di ruhê min de bi carekê ve bi hezaran qapax vebûne û niha ez bi pêla peyvê re xwe vala dikim. An na ez ê bifetisim, Nastenkaya delal. Ji ber vê yekê Nastenka, çi dibe, peyva min nebire, heya dawiyê bi hurmet li min guhdarî bike. Ger tu guhdarî nekî, ez nabêjim, ez ê bêdeng bimînim.

- Baş e, baş e, baş e! Ez careke din peyva te nabirim. Tu qal bike, êdî gotinek jî ji devê min dernakeve.

- Wê çaxê ez ê dewam bikim. Dosta min Nastenka, saeteke rojê heye ku ez gelekî jê hez dikim. Ev saeteke wilo ye ku hemû kes kar, mijûlî û xebatên xwe xelas dikin. Her kes ji bo bêhna xwe berdin, ji bo ku xwarina xwe bixwin, ber bi malên xwe ve dilezînîn. Heya ku ew digihîjin malê, di rê de bi hev re henekan dikin û behsa ku ew ê çawa êvarê û şevê xweş derbas bikin, dikin. Di vê saetê de qehremanê me jî - Bi destûra te be Nastenka, ez ê çîroka xwe bi şexsê sêyemîn bidomînin, ji ber ku gava ez bi şexsê yekemîn qal dikim, ez şerm dikim - erê qehremanê me yê ku li gorî wî karekî wî heye, ew jî vê saetê mîna her kesî li kuçê ye. Hebekî westiyayî ye, ji rûyê wî yê çilmisî şopa zewqeke seyr dixuye. Ew li vemirandina şewqên dawî yên asmanê sar, yên Petersburgê, bi heyecan temaşe dike. Gotina "temaşe dike" derew e, ya rastî ew van şewqan di hundurê xwe de hîs dike.

Ji ber ku ew westiyayî ye û mêjiyê wî bi tiştên hê balkêştir re mijûl e, tu bibêjî nebêjî wextê ku ew ji der û dora xwe re veqetîne, hindik. Gava ew karekî xwe yê zehmet xelas dike, mîna zarokekî dibistanê, ku piştî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dersên xwe bi çindikavêtinî ji xwe re dileyize, ew wilo dilşa ye, ji kêfa nikare di cihê xwe de raweste. Tu bala xwe bidiyê Nastenka, tu ê bibînî ev kêf û şahiya han sinirên mêrik hişyar dike, jêhatîbûna wî ya xeyalî ku di dereceya nexweşiyê de ye, dixe tevgerê. Mêrîk xayiz e, difikire...Ma gelo ew li çi difikire? Gelo ew li şîvê difikire?Wê çawa şeva xwe derbas bike? Ma tiştekî ku ew lê dinihêre heye? Gelo ew li silava ku dewlemendek di hundirê erebeya xwe de, dide xanimjinekê, difikire?... Na, Nastenka, têkiliyên wî bi tiştên wilo çirtovirto re nîn e. Ew niha bi karê xwe yê jiyanê ve mijûl e; biriqandina çirûskên dawî yên roja ku vedimire, ne bêsedem e. Dilê wî yê ku bi van çirûskan germ dibe, bi hezaran xwestek tê de şiyar dibin, heta tu bixwazî ruhê wî dewlemend dikin. Gava qehremanê me berê bi her awayî riya ku ew tê re diçû nas dikir, niha mîna ku ew rê qet tune ne, "Xwedaya Xeyalê" bi destên xwe yên jêhatî tara zêrînî ya gergefeyê amade dikir. (Nastenkaya hêja, ez bawer im te Jukavsky xwendiye).

Niha jî ew reqsên dinya çîrokên periyan yên dûrî aqilan dike. Kî dizane, dibe ku qehremanê me bi destên Xwedaya Xeyalê yên bi huner girtibe û heft qatan ber bi asmana ve bilind bûbe. Ew di riyên meşê yên kevirî de diçe malê. Tu dixwazî wî rawestînî, jê bipirsî bê ew li ku ye, ew bi ku ve diçe. Ew ê nikaribe bersiva ku ew li ku ye, an jî ew ê bi ku ve biçe, bide te; wê ji şerman rûyê wî sor bibe, ji bo ku ew xwe ji wê rewşê rizgar bike, ew ê dereweke bike. Ev e, tam di nava rê de, gava pîrejineke bi hurmet, ku riya xwe şaş kiribe, ji wî rê bipirse, ji nişka ve veciniqandina wî, li der û dora xwe mêzekirina wî û ji bo ku neqîre bi zorê xwegirtina wî ji vê tê. Bêhna qehremanê me teng dibe, rûyê wî da-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dilîqe û bi riya xwe ve diçe. Di wê navê de gelek kes li wî dinihêrin, dibişirin, peyvan diavêjinê; keçikeke biçûk jî, ji bo ku nekeve ber lingên wî, ji ber wî baz dide, ji ber bişirîna wî ya xayizkî ecêbmayî dimîne û ew jî bi bêedebî bi wî dikene. Lê qehremanê me qet van ferq nake. Eynî periya xewnerojkê, ji bo mekrohî be, pîrejina rêwî, xelkê bi mereq, keçika biçûk ( Ger qehremanê me di wê navê de di wir re derbas bûbe) ew gundiyên ku li Fontankayê li ser mavnayên bi rêz radizan jî - mîna ku mêş bikevin tevnepîrikan- li gergefînê çêkiriye. Mêrik hemû niqutandiye hundurê xwe û ketiye kulûba xwe, li ser sifrê rûniştiye, xwarina xwe xwariye û xelas kiriye; Berdestka wî, ya rûdaliqyayî û bi keder, Matriyona, piştî ku sifre da hev û qalûna wî da wî, ancax ew hingî bi ser xwe ve tê, û tê bîra wî, ku wî xwarina xwe xwariye û ew ecêbmayî dimîne, ku wî çawan ew hemû tişt kirine. Odeya wî di tariyê de maye, di ruhê wî de valahî û hizin heye. Ew dinya xeyalî ya ku di serê wî de zîz dibe, hêdî hêdî hilweşiya ye, bêî ku li dû xwe şopekê bihêle, mîna xewnerojkekê firiyaye û çûye. Êdî nayê bîra wî bê wî çi xeyal kiriye. Lê hîseke ku giran giran hundurê wî diêşîne, gava xwestekeke ku dilê wî hol dike ji hêza wî ya xeyalê xû digire, xuyayî an nexuyayî komek xeyal li dû xwe dikşîne. Li odeya wî ya piçûk bêdengî hukum dike; tenêtî û tiralî hêza wî ya xeyalê mist dide. Mîna qehweya di cezweyê Matriyanayê de, ku li metbaxê qehwê dikelîne, xeyal jî hêdî hêdî dikelin û dikevin hereketê. Her ku diçe ev kelandin xurttir dibe, ew pirtûka ku xeyalperestê me hema ji xwe re rahiştiyê, berî ku ew bigihîje rûpelên sisiyan, ji dest wî dikeve. Ev e, dinya wî ya xeyalan bi hemû hêza xwe jîndar



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bûye û hatiye avakirin. Dinyayeke nû, jiyaneke xweş î nû, bi hemû rengên xwe yên têvel li ber wî ye. Xeyal ji wî re riyên dilşahiyê vedikin. Tama wê cihê, xapînok, jehreke şêrîn e! Êdî tu karê wî bi jiyana me ya rastîn re tune ye! Em di çavên wî yên ku her tiştî berevajî dibîne de, jiyaneke tirale, bêkêr, bêzar dijîn; li gorî wî, em hemû, jiyana ku bi şansa me re ne li hev e, ji xwe re barekî dihesibînin.Bi rastî jî wilo ye, ma di awira pêşî de, ne mîna ku em ji hev xeyidîne û rûyên me ji hev daliqyayî ne, Nastenka? Yê xeyalperest "Rebenino" dibêje, gava ew me dibîne. Lê carekê jî tu li vê gerdûna balûpal ya xeyalan ku mîna tabloyeke bi rengên herî jîndar, herî berbiçav, herî efsûnker, vedibe, binihêre! Xwezayî ye ku yê herî li pêş jî xeyalperestê me ye. Serpêhatiyên cihê cihê, hulyayên bê ser û bin li dû hev dikişin û tên. Em binihêrin bê ew çi ava dike... Ma hêjaye ku mirov li vê jî bifikire?... Di xeyalên wî de her tişt heye... Ew pêşî mîna şaîrekî nenas, lê paşê jî mîna şaîrekî ku taca navdariyê li serî ye, dest bi karê xwe dike. Hevaltiya wî ya bi Hoffman re, Şeva Bertelemî, Diana Vernan û li dû vê jî qehremaniya Ivan Vasilyevîç ya standina bajarê Kazanê. Piştî wê jî Klara Moubray, Evfiya Dense, îfadegirtina Jean Huss ya li meclîsa keşeyan, li Robertê rabûna miriyan. (Gelo muzîka wê tê bîra te? Mîna ku bêhna gorrê têkeve pozê mirov). Minna û Brande, Şerê Brezînayê, Danton, Kleopetra ei suoi amanti, maleke piçûk li Kolumnayê - ev mala piçûk ya wî ye - û li wê mala piçûk melekeke min a delal, eynî benderuheke mîna te dilovan, şevên zivistanan, bi devê jihevmayî, li xeyalperestê me guhdarî dike...

Ev e, wilo ye, Nastenka, ma çi qîmeta me mirovên



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

normal li ba vî peyayê ku ji tiraliyê zewqê distîne, heye. Li gorî wî em jiyaneke reben û bi êş dijîn. Lê gava dema wê were, bêî ku ew çavên xwe bikutkutîne, ew ê ji bo rojeke vê jiyana reben û bi êş hemû salên xwe yên xeyalê bide. Wê ev li demeke nexweş rast were, lê ew qet li vê yekê nafikire. Hem jî bêî ku ew ji berdêla salên xwe yên xeyalan kêfxweşî û dilşahiyekê bipê, ew salên xwe yên xeyalan dide. Ew ê hizin, poşmanî, kedera bêsînor çavên wî netirsîne. Mirov dê çi bike hê, ew dem, ew dema bêtirs hatiye, xeyalperestê me tu xwestekan hîs nake. Ji ber ku ew xwe di ser hemû xwestekan re digire, her tişt li ber destên wî ne, ew hînî her tiştî bûye... Ew jiyana xwe ava dike, her dem jiyanê li gorî daxwaza dilê xwe dixe şikil û celebên cihê. Ev gerdûna xeyalan wisan bi hêsanî, wisan xwezayî ava dibe ku, mirov qet bîr nabe ku xeyal e. Ji xwe leylana ku ji gerdûna xeyalan û ji xapandina hîsan dizê, ew hîç bawer nake ku hulyayeke xapînok e; ev ji bo wî rastiyek e, rastî bi xwe ye.

Ma tu nabêjî Nastenka, ji bo çi di demên wilo de xeyalperestê me ji kêfan dike bifire? Kîjan hêz, kîjan hêza nexuyayî lêdana nebzê zêdetir dike, hêsir ji çavan tîne? Ji bo çi gava rûyê wî yê çilmisî û gepên wî yên şil bi kize kiz dişewitin, hemû ezîtiya wî dibe şahiyeke bicoş? Ji bo çi şevên wî yên ku di dilşahiyeke bêdawî û geş de derbas dibin, ji bo wî mîna kêlîkekê kurt tê? Qehremanê me di odeya xwe ya ku pencereyên wê bi şewqên pembe ve sor dibe, piştî buhurandina saetên bicoş, westiyayî û mîna nexweşan xwe diavêje ser nivînê xwe. Gava ew çavên xwe digire, xweşiyeke kûr hîs dike. Şewqeke xapînok ya xeyalan ku aîdî Petersburgê ye, dest pê dike û hundurê wî rohnî dike.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Wilo ye Nastenka! Gava mirov ji derve binihêre, mirov dê bixape û bibêje qey ew coşiya ku xwe li ezîtiya wî pêçaye, rast e. Qet ne hêsan e, ku mirov di xeyalên wilo bêbingeh de baweriya xwe bi tiştên ku bi çavan tên dîtin û bi destan tên girtin, neyne. Lê hemû derew e!... Hem jî derewên çilo ne Nastenka, çi derew!... Em bibêjin, ew dildar bûye; ew hemû coşiyên hezkirinê, liberketinên aciziyê di hundurê xwe de hîs dike... Tu berê vî biguhere û bi dîqet lê binihêre! Te hişê ku wî rûyê ya ku ew di xeyalên xwe de bêhawe jê hez dike, nedîtiye, Nastenka? Ma tu bî tu ê bawer bikî ku ew di xewn û xeyalên xwe de bi tenê hezkiriya xwe dibîne? Ma ev yeka han dikare derew be, ku wî dev ji hemû dinyayê berdaye û bi vê hezkiriya xwe re dest di dest de, dil bi dil re dijî? Gava dem dereng bibe û wextê jihevveqetînê were; wê çaxê ma ew jina ku di hewa girtî û bi bahoz de, bêî ku ew guh bide wî bayê ku hêsirên wê ji bijankên wê yên reş direvîne û dibe, serê xwe datîne ser sînga hezkiriyê xwe û bi qûre qûr digirî, kî ye? Bi hevbaweriya wan, hevduxwestina wan, "Evqas sal ji kûraniyê " hezkirina wan, gava ew bi serê xwe, bi hev re derdikevin gerê, bexçeyê jibîrbûyî, bêdeng, wêran û bi hizin; û ma ew riyên bexçeyan yên bi kevz xeyal bûn? Lê ew xaniyê xerîb yê ku ji kêlik mabû? Hezkiriya wî li vir bi mêrê xwe yê kal, bêreng û mekroh re jiyaneke girtî û tijî keder dibuhurand. Hezkiriyên ku evînên ji hevdu jî vedişartin, ziravên wan ji vî peyayê bi hirçînî û hindik dipeyivî, diqetiyan. Digel van hemû xemgînî û tirsan, evîneke wan a gelekî pak û bêguneh hebû. Lê mirov neçê difikirin, Nastenka. ( Her wilo ye ). Paşê, ew ji cî û warê xwe dûr, di binê asmanekî biyanî, ku ji tava rojê dişewitî, li bajarekî ku tijî serpêhatiyên



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bêdawî, li baloyeke pak ya sarayekê ( Bêî sarayê hîç çênabe! ) ew pêrgî hezkiriya xwe tê. Hezkiriya wî li balkona ku bi gelek şewqan rohnî bûye, bi gul û şaxên defneyan hatiye pêçan, hezkiriyê xwe nas dike, maskeya baloyê diavêje; bi dengekî ku ji heyecanê dilerize, " Êdî ez azad im..." di ber xwe de dibêje. Hezkiriyên ku hevdu hembêz dikin, ji hevveqetîna di coşiyên evînan de, liberketinên bi êş, mêrê kal, bexçeyê nexweş yê ku li cî û warên wan yên kevin maye, mala tijî bêhntengî, ew kêlîka piştî maçîkirina dawî ku bi zorê ji hev vediqetin, ew her tiştî, her tiştî ji bîr dikin.

Tam di wê navê de, ji nişka ve derî vedibe; hevalê wî yê xort, bejindirêj, li ser xwe, zimandirêj, qeşmer, di derî de xuya dibe û mîna ku tiştek nebûbe, " Ez niha ji Pavlovskê têm!" dibêje û bi gazin dikeve hundur. Hingî mîna ku satilek av bi ser serê xeyalperestê me de bête dakirin, ew dikeve telaşeke zarokekî ku sêvek ji bexçeyê cîranê xwe dizîbe û dilebike ku wê sêvê têxe bêrîka xwe, şaş û ecêbmayî dimîne. Ew ko kontê kal miriye, riyên dilşahiyê vebûne. Vê carê jî hevalê wî yê ku ji Pavlovskayê hatiye, dibe bela serê wî.

Min peyva xwe ya bi coş bi heyecan birî û ez bêdeng mam. Ji ber ku min hîs dikir ku tu nemabû kenekî bi pîrqîn di hundurê min de biteqiya. Şeytanê di ruhê min de dest bi lebitandinê kiribû. Çenga min dilerizî, çavên min tarî dibûn, min nikarîbû bêhna xwe bigirta û berdaya. Tiştekî din jî ku ez jê tirsiyam ew bû, Nastenka çavên xwe yên zekî vekiribûn û mîna zarokan bi dînîtî û bi pirqîn dikeniya. Ez pir poşman bûbûm. Min fêhm dikir, ku ez di çîroka bi carekê ve avêtina der ya hemû hîsên ku ji mêj ve di dilê min de hilnedihatin, pir bi pêş de çûbûm. Ji ber ku min texmîn nedikir wê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

yekî ku ji min fêhm bike derkeve, min biryar dabû ku ez hemûyî mîna ku ji pirtûkekê dixwînim, qal bikim. Lê min nikarîbû xwe bigirta, min bêsedem hundurê xwe vala kiribû. Çi ecêb e, deng ji Nastenkayê dernediket.

Wê piştî kurtedemekê, destê min hêdî şidand, bi tirseke meyildar pirsî:

- Ma bi rastî te hemû jiyana xwe bi vî awayî buhurandiye?

- Erê, Nastenka, her bi vî awayî... Û ez wilo bawer im ku wê heta dawiyê jî wilo here.

Bi dengekî xemgîn:

- Na, çênabe! wê got. Divê çênebe! Ger wilo be, tête wê maneyê ku divê ez jî hemû jiyana xwe li ber çongên pîrika xwe bibuhurînim. Jiyaneke wilo gelekî xerab e!

Ji ber ku min nikarîbû hê bêtir hîsên xwe gem bikim;

- Ez dizanim, Nastenka, ez dizanim! min bi qêrîn got. Ez niha ji her car bêtir fêhm dikim, ku min hemû salên xwe yên baş vala buhurandine! Ji ber tiştê ku bûye, ew di rûyê min dibêje, her ku ez difikirim ku Xwedê Meleka min ya dilpak, yanî tu ji min re şandiye, xemgîniya min zêdetir dibe. Niha gava ez li ba te rûniştîme û bi te re dipeyivim, li pêşerojê fikirandin bi min ecêb tê. Ji ber ku di pêşerojê de, dîsan jiyaneke bi tenê, kufukî û bêmane li bendî min e. Gava ez li ba te, di jiyana rastîn de ewçend dilşa bim, xeyalkirin bi kêrî çi tê? Ji ber ku te ez tavilê red nekirim û te îmkana ku ez du rojan bijîm, da min, Xwedê ji te razî be!

Nastenkaya ku hêsirên wê di çavên wê de dibiriqîn:

- Na, na! Bila êdî wilo nebe! bi qêrîn got. Em ê niha hema ji hev veneqetin! Du şev pir hindik in!

- Ax, Nastenka, Nastenka! Ma tu dizanî ku te ez



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

demeke dirêj xwe bi xwe re kirim yek? Ez ê êdî di derheqa xwe de ewçend xerab nefikirim. Tu dizanî, belkî ez mîna yekî ku sûc û guneh kiribe - ma jiyaneke wilo ji sûc û guneh wêdetir çi ye ku! - ji dîtinê bigerim. Çi dibe, tu nefikirî ku di gotinên min de nepixandinek heye. Tu bawer dikî, carina demên min yên wilo fetisokî çêdibin, gava ez dibînim, qeweta min tune ye ku ez jiyaneke rastîn bijîm, ez rastiyê û bûyerên ku diherikin û diçin bi zehmetî têdigihêm, ez korbûna hîsên xwe hîs dikim, ez naletê li xwe tînim. Tu nizanî bê veqetandina piştî şevên xeyalî çiqas zehmet e. Erê, yek jê jî tu ê bibînî ku mirov bi dînîtî di nava pêla jiyanê de dijîn. Jiyana wan ne li ser xwestinê ye, mîna xeyal û xewnerojkan nafirin û naçin, her tim tê guhertin, ciwan dimîne , saetek ya din nagire. Lê xeyala ku girtiya tarîtî û ramanê be, bê zar e. Digel amdebûna wê ya firînê, monotoniyeke wê ya sernizm heye. Ew ewrê roja ku xelkê Petersburgê li ser can didin, bi carekê ve dinixumîne, û digel nuxumandina rojê, dilê mirovan jî reş dike, ew xwediyê dinyaya xeyalan e; Ka tu bi xwe li xeyalên ku di demên wilo nexweş de têne çêkirin, bifikire!

Ew xeyalên ku mirov bawer nake wê dawî were, li dû şidandina berdewam ya rehên mirovî, hêdî hêdî dimire, winda dibe, diçe. Ji ber ku jiyaneke we ya din tune ye, ew dinyaya ku we ji îdealên xwe yên kevin, ji bermayên xeyalên kevin ava kiriye, dîsan li ber xerabbûn û wêranbûnê ye. Lê canên me tiştên din dixwazin. Mîna ku xeyalperestê me li nava xweliyê, li bizotên êgir bigire, ji bo dadana agirê ku dilê wî yê sarbûyî germ bike, ew di nava kevnexeyalên xwe de li çirûskekê digere. Agirê ku pêxîne wê bi xwîna wî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bikeve û wê li gerdûna xapînok a bi reng ku wî ji xwe re ava kiriye, xwe bibîne û zewqa ku hêstiran ji çavên wî tîne, bitahmîne. Tu nizane bê xeyalkirin min digihîne ku, Nastenka. Digel ku derew e û bêbingeh e, lê ji ber ku ruhê min mist dide, tiştê ku ez dixwazim bi bîr bînim, kevnehîsên min - xeyalên min yên pûç û stewr - ez êdî salvegerên wan pîroz dikim . Li gorî ez bûyereke ku xeyal dikim, najîm, ez xeyala xeyalên pûç dijîm! Ez kevnecihên ku lê dilşa dibûm ji bîr nakim, hin caran ji gera li wan deran hez dikim. Ji ber wê yekê, ez bi xwestina tama ku tama rojên buhurî tevlî jiyana xwe ya niha bikim, di kuçe û kolanên bajêr de mîna siyekê xemgîn, bi kul û keder û betal digerim. Ma di wê navê de çi nayên bîra min! Wek mînak, gava ez digihîjim cihekî, tam mîna ku ez berî bi salekê, di eynî saetê de, bi xemgînî û bi tenê di wir re derbas bûbim, tê bîra min. Digel ku ez dizanim kevnexeyalên min hîç nexweş in, ji ber ku ez ji ber fikrên bedbîn ku pêsîra min bernadin, difetisim, difikirim ku ez berê hê bêtir bi huzûr bûm, di wê demê de jan û êşên min yên hundurîn, ku şev û rojên min li min diherimandin cihê bû, reşbîniya ku ez ji êşê digevizandim guherî bû. Ez carinan ji xwe re "Xeyalên te li ku ne?" dipirsim. Lê ji bilî ku ez serê xwe bihejînim û bibêjim "Sal çiqas zû derbas dibin" pê ve, tu çareyeke min tune ye. Vê carê pirsin din têne hişê min: "Baş e, te çi kir ji salên xwe? Te salên jiyana xwe yên herî xweş li ku veşartin? Tu jiya, an jî tu bawerî ku tu dijî?" Dengek ji hundurê min bilind dibe: " Binihêr, tiştên li der û dora te her ku dihere çawan sar dibin? Ka bila çend salên din jî derbas bibe, tu ê bibînî ku tu bi tenê yî, kal bûyî, xwe spartiyî gopalê xwe û diricifî. Piştî wê jî bêhêvîtî,



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

keder, bêzar... Wê rojek were ku dinya min ya xeyalan ser û bin bibe, wê xeyalên min wek pelên zer yek bi yek biweşin... Ax, Nastenka! Wê çaxê hem ji bo ku ez bi tenê, tikû tenê mame, hem jî ji bo ku tiştekî min ê liberketinê namîne, ez ê li xwe xim. Ji ber ku hemû tiştên ku ez ê winda bikim, ji xeyalên bêqîmet pê ve ne tiştek in!

Nastenka hêsirê xwe pakij kir û,

- Bes e, dilê min hê zêde perçe meke! got. Her tişt êdî temam bû. Ji niha pê ve ez heme; çi dibe bila bibe, em hew ji hev vediqetin. Li min guhdarî bike. Ez keçikeke sade me. Digel ku pîrka min ji min re mamoste girtibû jî min zêde nexwend. Digel vê jî ez te fêhm dikim, ji ber ku ji çirka pîrka min kirasê min bi yê xwe ve derzî kiriye, ew tiştên te niha qal dikirin, ez jî hemûyî jiya me. Bêşik ez nikarim mîna te xweş behs bikim, ji ber ku ez nexwende me.

Di her tevgereke Nastenkayê de xuya dibû, ku wê ji peyva min ya bi coş û ji uslûba min ya bilind re hurmet nîşan dida. Bi dengekî bi tirs got:

- Lê ji bo ku te dilê xwe ji min re vekir ez dilşa me. Ez êdî dikarim bibêjim ku ez te baş nas dikim. Paşê gotineke min ya din jî heye: Ez ê jî ji te re çîroka hemû jiyana xwe bibêjim, hem jî bêî ku ez tiştekî jê veşêrim. Tu ê li hemberî vê êqil bidî min. Tu peyayekî pir jîr î. Tu ê alîkariya min bikî, ne wilo?

- Ax, Nastenka, min ji kesî re mamostetiyeke baş ya êqil nekiriye! Lê vê carê rewş cihê ye... Mafir ku em ê ji niha û pê ve nêzîkî hev bin, wê çaxê em dikarin bi hev re pir bipeyivin, li hevdu guhdarî bikin û hevdu şîret bikin. Êh, de bibêje, Nastenkaya min ya xweşik, tu aqilekî çilo ji min dixwazî? Her tiştên xwe vekirî bibêje! Ez niha ewqas kêfxweş, dilşa û mêrxas im; serê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

min wilo dixebite ku, ez ê zehmetiya ku bersivan bi te ve bigihînim, nebînim.

Nastenka bi ken peyva min birrî.

- Na... Na!... Tu ê ne tenê bersiveke biaqil bidî min, herweha divê mîna ku tu bi salan ji min hez dikî, ji dil, şîreteke biratî li min bikî.

- Baş e, çêbû! min bi dengê bilind got. Ger min bîst salan jî ji te hez bikira, min ê dîsan bi qasî vê kêliyê ji te hez nekira.

- Wê çaxê destên xwe bide min!

Min destê xwe direjî wê kirin.

- Em ê niha jî dest bi çîroka min bikin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Çîroka Nastenkayê

- Tu bi nîvê çîroka min dizanî, yanî tu dizanî ku pîrikeke min heye...

Min bi ken peyva wê birî:

- Ger nîvê din jî bi qasî vê kurt be.

- Hiş be û guhdarî bike. Berî her tiştî şertekî min heye. Divê tu qet peyva min nebirî, an na ez ê xwe şaş bikim. Niha, bi biaqilî li min guhdarî bike.

Pîrikeke min heye. Gava dê û bavê min dimirin, pîrika min, min biçûkî dibe ba xwe. Ji ber ku ew her rojên xwe yên xweş bi bîr tîne, ew di dema xwe de jineke halxweş bûye. Wê ez hînî fransî kirim, wê ji min re mamoste girt û ders da min. Gava ez ketim panzdeh saliya xwe ( ez niha hivdeh salî me) me dev ji dersan berda. A wê demê min nerehetiyek kir. Ez ê ji te re nebêjim bê min çi kiriye, lê tu mîna tiştekî bêqîmet bibînî. Pîrika min sibehekê bang min kir. Ji ber ku çavên wê nedidîtin, wê got ku, ji bo ez bikaribim li te miqate bim, divê ez kirasê te bi yê xwe ve derzî bikim. Diviya bû heta ku ez mezin bibûma, ez wilo bi wê ve bûma. Ez



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

demeke dirêj ji wê veneqetiyam. Gava min kar dikir, min dirûn dikir, ez dersa xwe dixebitîm, ez bi gavekê jî ji wê bi dûr nediketim. Min carekê xwest ez pîrka xwe bixapînim. Min li şûna xwe Fiyolka da rûniştandin. Fiyolka cêriya me ye, kerr e. Jinik li ser kursiya min rûnişt. Gava pîrka min li ser qoltixa xwe di xew re çû, ez jî çûme ba hevaleke xwe. Lê belê dawiyê qet jî baş nebû. Gava pîrka min hişyar bûye, ji wê weye ku ez hê bêdeng li ba wê rûniştime, loma wê tiştek pirsî ye. Fiyolka dîtiye ku pîrka min ji wê tiştekî dixwaze, lê ji ber ku guhên wê giran in, wê nebihîstiye. Ji ber ku wê nizanîbû ku ew ê çi bike, wê hema derzî ji kirasê xwe kişandiye û ji wir çûye.

Nastenka navbir da peyva xwe û bi hîke hîk keniya. Gava ez jî bi wê re keniyam, wê tavilê kenê xwe birî.

- Çi dibe, tu mekene. Ji ber ku bi min ecêb tê ez loma dikenim... Ez çi bikim, pîrka min jinikeke wilo ye. Lê ez dîsan jî hebekî ji wê hez dikim. Tenê ez bi erzşikandina wê ya wê rojê dizanim. Wê ez ji nû ve li cihê min yê berê da rûniştandin, êdî ez nikarîbûm bi gavekê jî ji wê bi dûr biketima. Haa, min ji bîr kir ku ez bibêjim, maleke me, yanî maleke pîrka min heye. A rastî xaniyekî me yê ji text û sêpaceyî, mîna pîrka min kone û biçûk heye... Odeyek jî li jor heye...

Min dest bi peyvê kir:

- Dêmekê kirêdarê we yê kevin jî hebû? min jê pirsî.

- Erê, hebû... Hem jî ew ne weke te geveze bû. Te nikarîbû devê wî bi kêrê vekira. Ew kaloyekî lal, kerr, kulek û piştxûz bû. Ji ber zehmetiya jiyaneke bi wî celebî, wî debar nekir, mir. Em fikirîn ku wê bêî kirêdarekî zehmet be, me rabû di şûna wî de yekî din girt. Berevajiya kalo, evê nû, yekî xort bû. Ew ne ji vir



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bû, ji gund hatibû. Ji ber ku wî bi me re bazar nekir, pîrka min tavilê ode da wî. Paşê, "Kirêdarê me yê nû çawa ye nastenka? Ew xort e, kal e?" wê pirsîbû.

Min nexwestibû ez derewan bikim.

- Ne ewqas xort e, lê ne kal e jî, min gotê.

Pîrka min dixwest bi her tiştê wî bizanibe.

- Baş e, ew çawan dixuye? Ma ew çeleng e?

Min dîsan ya rast jê re got:

- Erê, pîrkê, ew çeleng e...

- Dêmek ez ê pir bikişînim. Binêr keça min, paşê tu nebêje "pîrka min ji min re negot", tu tu bî, tu dil nekevî vî camêrî. Ka em binêrin bê wê çi were serê me. Ji ber ku mêrikê xerîb odeya me kirê kiriye, ew di çavê me de şêrîn dixuye. Ma berê wilo bû?

Rojên berê ji devê pîrka min dernediketin. Berê ew ciwantir bû, germa rojê zêdetir bû, dawiya şîr weke niha zû nedihat. Her tiştê berê baş bû. Ew tiştên ku pîrka min di derheqa kirêdarê me de ji min re gotin, şîretên ku li min kirin, min hemû li ser hev carekê bi bîr anîn. Lê paşê gava min dest bi nexşan û hûnandina goreyan kir, min ew hemû ji bîr kirin.

Kirêdarê me sibehekê hate ba me. Ew ê pîrka min kaxez li dîwarên odeya bi kirê bixista, ew hatibû ku wê yekê di bîra pîrka min de bîne. Peyvê peyv vekir... Pîrka min jî zêde napeyive. Di navberekê de ji min re got:

- Heydê Nastenka, here oda min û qutîka min a hesaban bîne.

Ez tavilê rabûm. Rûyê min weke sêlê sincirî bû. Ji ber ku di wê navê de min ji bîr kiribû ku kirasê pîrka min bi kirasê min ve derzîkirî bû, bi holbûna min re qoltixa pîrka min jî wergeriyabû û bi dû min de hatibû



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

kişandin. Ji ber ku li hemberî kirêdarê me hemû foya min derketibû meydanê, rûyê min hê bêtir sor bûbû, ez kirî ji fediyan têketima binê erdê. Hema min got kûr û ez giriyam. Ger hingî erd biqelişiya û ez têketimayê çêtir bû.

Gava pîrka min bi qêrîn got:

- Tu çi sekinî yî ?

Hingî îskîna min zêdetir bû. Gava kirêdar têgihîşt ku ez ji wî fedî dikim, wî xatir ji me xwest û çû.

Piştî wê rojê, her ku ez li korîdorê dengê teperepa lingên kesekî bibihîzim, ziravê min diqete. Bi fikra ku wê kirêdarê me were, ez kirasê xwe ji yê pîrka xwe diqetînim. Lê her carê jî ne kirêdar, lê yekî din dihat. Du hefte wilo bihurîn. Rojekê kirêdarê me bi Fiyolkayê re xeber şand ku komek pirtûkên wî yên bi fransî, xweşik û hêjayî xwendinê hene. Wî gotibû ku pîrê aciz e, ger ez bixwazim jê re bixwînim, ew dikare wê koma pirtûkên xwe ji me re bişîne. Pîrka min bi kêfxweşî qebûl kir. Lê wê mereq dikir, bê bi rastî ew pirtûk baş in an na.

- Ev ne pirtûkên exlaqxerabkirinê bin, Nastenka, wê got. Ez pirtûkên wilo bi te nadime xwendin, tu ê bi xwendina pirtûkên wilo hînî tiştên ne baş bibî.

- Ew tiştên nebaş ku tu dibêjî çi ne, pîrkê? Ma di van pirtûkan de çi hene?

- Ma te got çi di wan de hene? Di wan de xortên ku keçikên malbatên baş ji rê dibin, soza zewacê didine wan û paşê wan li kuçeyan berdidin û keçik dikevin rewşên ku gunehê mirov bi wan were, hene. Min gelek pirtûkên wilo xwendine keça min; gava mirov wan dixe destên xwe, êdî ne xew dikeve çavên mirov û ne tiştekî din... Ji ber vê yekê tiştên ku ez dixwazim ji te re



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bibêjim ev e: Tu destên xwe bi wan meke! Ka ez binihêrim bê wî çi pirtûk şandine.

- Hemû romanên Walter Scott in, pîrkê.

- Te got romanên Walter Scott in? Di vê de fenek tune be? Eman keça min, dîqet bike, di nava rûpelên pirtûkan de nameyên evînî tune bin.

- Tiştekî wilo tune ye, pîrkê.

- Tu li nava cildan binihêre. Aqilê mirov nagihîje karên hîlekarên wilo.

- Di nava cildan de jî tiştek tune ye.

- Êh, wê çaxê baş e.

Me bi vî awayî dest pê kir û Walter Scott xwend. Di hundurê mehekê de me nîvê pirtûkan xelas kir. Kirêdarê me ji me re bêî navbir pirtûkên nû dişand. Vê dawiyê wî çend heb jî ji Pûşkîn şandin.

Wilo bûbû ku ger pirtûkên nû nehatana, bêhna min teng dibû. Ez êdî hew li zewaca bi kurê Padîşahê Periyan re difikirîm.

Çawa bû, ez nizanim, lê ez rojekê li ser pêlikê pêrgî kirêdar bûm. Pîrka min ez şandibûm da tiştekî bikirim. Mêrik sekinî. Rûyê me herduyan jî sor bû. Lê ew tavilê keniya û silav da min. Paşê wî li hal û wextê pîrka min pirsî û meraq kir bê min ew pirtûk ji wê re xwendine an na. Min jî jê re got, ku min ew xwendine. Wî hingî ji min pirsî:

- We herî pir ji kîjan pirtûkê hez kir?

Min jî jê re got:

- Ji berhemên Ivanhoe û yên Pûşkîn.

Peyva me ya wê çaxê ewqas dom kir.

Piştî hefteyeke din ez dîsan li ser pêlikê pêrgî wî hatim. Vê carê pîrka min ez neşandibûm, min derewek li hev anîbû û ez derketibûm. Saet sisiyê piştî nîvro bû.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Kirêdarê me her tim di wê saetê de dihate malê.

- Rojbaş, wî got.

Min jî bersiva wî da:

- Rojbaş.

- Ma tu aciz nabî ku tu hemû rojê li ba pîrika xwe rûdinê?

Ji ber wê gotina wî min wilo şerm kir, wilo şerm kir, ku tu nizanî! Pir li zora min çûbû, ku wî bi rewşa min dizanîbû. Herçiqas min nexwest ez bersiv bidim û ji ba wî bi dûr bikevim jî, lê min nikarîbû. - Tu keçikeke qenc î, wî got. Ji ber vê gotina min ez lêborînê dixwazim. Bawer bike, ez ji pîrka te bêtir qenciya te dixwazim. Ma keçikên hevalên te yên ku hûn herin ba hev û hevdu bibînin tune ne?

Min jê re got, tune ne. Bi tenê Maşenka hebû, ew jî çûbû Pskovayê.

- Tu bi min re nayê Operayê?

- Opera? Lê em ê çi bikin ji pîrka min?

- Em ji wê re nabêjin.

- Çênabe, ez nikarim pîrka xwe bixapînim. Di xweşiyê de bimîne.

- Oxir be.

Jê pê ve wî tiştek negot.

Piştî şîvê min dît ku ew hate ba me. Ew li ba me rûnişt û em tibabekî peyivîn. Li hebûn û tunebûna nasên me pirsî û meraq kir bê pîrka min diçe ku derê. Paşê bi carekê ve:

- Min îro li Operayê, ji bo Berberê Sevîlayê locayek veqetandiye. Ez ê bi hevalan re biçûma, lê karê wan derketiye, ew nikarin werin. Bilêt di destên min de mane.

Pîrka min bi kêf:



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Berberê Sevîlayê? jê pirsî. Ne ew Berberê Sevîlayê yê ku di ciwaniya min de dileyist be?

Kirêdar:

- Eynî ew bi xwe ye! got. Wî di bin çavan re jî li min nihêrî. Min wê çaxê rewş fêhm kir, rûyê min sor bû, dilê min bi gurmînî lêxist.

- Dêmek ew Berberê Sevîlayê yê kevin... hey gidî dinyayê, hey!... Di ciwaniya min de li mala me dikeke me ya biçûk hebû. Li ser wê dikê Rozîna hatibû leyistin.

- Ma tu naxwazî îşev Berberê Sevîlayê bibînî? Qet nebe bila bilêtên min neşewitin.

Pîrka min qebûl kir.

- Baş e, em herin. Nastenkaya min hê nizane bê opera çi ye.

Ez nikarîbûm ji kêfan li cihê xwe rawestiyama. Em hema rabûn, me xwe hazir kir û em ketin rê. Ji ber ku çavên pîrka min hew didîtin, ew tenê hatibû ji bo ku li muzîkê guhdarî bike. Ya rastî wê ew yeka han ji bo min kiribû. Çawa be jî dîsan pîrka min jinek bû. Lê ger bi me bimaya, me ê gava xwe neavêtiba derve. Ez ê ji te re behsa ku Berberê Sevîlayê çawa bû, nekim. Heta ku Berberê Sevelîyayê tewaw bû, kirêdarê me wilo bi çavekî mistdayîn li min dinihêrî, ew wilo xweş dipeyivî, ku min tavilê fêhm kir ji bo ku ew min biceribîne, wî ez bi roj vexwandime operayê. Ez ji kêfan di qalikê xwe de hilnedihatim. Ez wê şevê gelekî ji xwe razî bûm, ez bêhawe dilşa bûm. Dilê min bi şidet lêdixist, agirê min jî hebekî bilind bûbû. Berberê Sevîlayê hemû şevê hate xewna min.

Min texmîn dikir ku ew ê piştî wê şevê her tim were mala me, lê hîç ne wilo bû.Tu nema bû wî çûyin û



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hatina xwe bibiriya. Ji mehê carekê, ji bo çûyina operayê li deriyê me dixist. Em carek du carên din jî bi wî re çûne operayê. Lê ew yeka han qet li xweşa min nediçû. Min dizanîbû ji ber ku gunehê wî bi min dihat wî em diezimand. Ma wê jê pê ve ji ber çi bûya? Her ku roj derbas dibûn, ez diketim rewşeke ecêb, nikarîbûm di cihê xwe de rawestiyama. Ne min dikarîbû pirtûk bixwendina, ne jî min dikarîbû tu karên destan bikira. Carna jî kenekî ez digirtim, min pîrka xwe diqeherand, carna jî ez ji dil digiriyam. Dawiyê ez wilo jar bûm ku tu nemabû ez têketima nava nivînan. Demsala operayê derbas bûbû. Kirêdarê me êdî qet nedihate seredana me. Gava em pêrgî hevdu dibûn jî - ew jî her tim li ser pêlikê dibû- mîna ku wî nedixwest ew bi min re bipeyive, wî bi cidî silav dida min û tavilê ji wir bi dûr diket. Ê min jî rûyê min sor dibû û ez wilo di nava pêlikan de dimam. Ji xwe gava ez pêrgî wî dibûm, xwîna min dadiwerivî mêjiyê min.

Eh, wextî dawiya çîroka min were. Ta di gulana par de wî hat ji pîrka min re got, ku karê wî yê li vir xelas dibe û ew ê ji bo salekê here Moskovayê. Gava min ew bihîst, aqil di serê min de nema, hema ez li ser kursiya xwe rûniştim. Baş bû ku wê yeka han bala pîrka min nekişand. Kirêdar jî xatir ji me xwest û çû.

Baş e, min ê niha çi bikira!... Ez fikirîm, ez çûm û hatim û min paşê biryara xwe da. Ew ê sibehê biçûya. Ji bo ku ez bikaribim biryara xwe bi cih bînim, ez li bendî razana pîrka xwe rawestiyam. Mîna ku ez fikirîbûm jî min kir. Min hemû kincên xwe pêçan, xistin buxçikekê, rahişt buxçikê û ez çûme banî, odeya kirêdar. Te digot qey xwîn ji damarên min hatibû kişandin. Heta odeya jor bi min bi qasî saetek rê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hatibû. Gava min derî vekir û ez ketim hundur, mîna ku kirêdarê me sawêr (şevreşk) dîtibe, ew ji cihê xwe hol bû. Lê gava ew têgihîşt ku ez bi zorê li ser lingên xwe radiwestim, wî baz da û ji min re qedehek av anî. Ji lêdana dilê min, mêjiyê min digizgizî. Serê min tevliheh bûbû. Gava ez hebekî bi ser hişê xwe ve hatim, min buxçuka xwe danî ser nivîna. Min jî hema xwe li wir da erdê, bi destan ser çavên xwe nixumand û hêsirên min mîna baranê diherikîn. Wî her tişt fêhm kiribû. Rûyê wî zipîzer bûbû û ew li pêşberî min rawestiyabû bû. Gava min ew nêrînên wî yên xemgîn dîtin, tu nema bû dilê min biperçiviya.

- Binêr Nastenka, wî dest bi peyvê kir. Ez mirovekî belengaz im. Ne pere û pûlê min û ne jî karekî min î bi rêk û pêk heye. Ger em bizewicin, ez ê çawan we xwedî bikim?

Em pir peyivîn, min nikarîbû zora qehra xwe bibira. Min jê re got, ku ez hew dikarim li ba pîrka xwe, kirasê min bi kirasê wê ve derzîkirî rûnêm, ez ê bi çolan bikevim; min jê re got, ger ew bixwaze, ez ê bikaribim bi wî re herime Moskovayê. Min bi ser vekir, ku ez ê nikaribim bêî wî bijîm. Şerm, hezkirin, gûrûr; hemû hîs di hundurê min de tevlihev bûbûn. Ji heyecanê tebatî nedikete min, min xwe avêt ser nivînê wî. Ez ditirsiyam ku ew ê xwesteka min bi paş ve vegerîne.

Ew çend deqîqeyan ji cihê xwe tevneliviya. Paşê rabû, hate ba min û bi destê min girt. Çavên wî jî şil bûbûn.

- Cana min, Nastenka, keçika min a dilpak, li min guhdarî bike. Ez ji te re soz didim ku ez ê rojekê werime dereceya zewacê, hingî dilşahiya min ya jiyanê wê tu be. Ez ê niha herim Moskovayê, ez ê li wir bi qasî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

salekê bimînim. Ez hêvîdar im ku ez ê bikaribim karê xwe têxime rê. Gava ez vegerim, ger te ez ji bîr nekiribim, em ê bizewicin û dilşa bibin. Ez ji te re soz didim. Lê niha nabe, hîç mafê min tune ye ku ez ji niha ve ji te re soz bidim. Ev e, ez dîsan dibêjim, ger piştî salekê jî nebe, ew ê ji sedî sed rojekê bibe. Dibe ku tu yekî ji min çêtir bibînî. Ji ber vê yekê ez naxwazim te bi soza xwe ve girê bidim.

Piştî wan gotinan jî, dotira rojê ew rabû û çû. Min biryara xwe dabû, ji tiştên ku em peyivîne, ez gotinekê jî ji pîrka xwe re nabêjim. Wî wilo xwestibû. Ev e, hêdî hêdî dawiya çîroka min tê. Saleke wî tijî bûye, ev tam sê rojên wî ne ku ew li vir e.

Ji bo ku ez dawiya çîroka wê bibihîzim ez bêsebir bûm.

- Ê, paşê, min bi dengekî bilind got.

Mîna ku Nastenka bi zehmetî dipeyivî.

- Ew hê jî nexuyaye. Ez tu xeberê ji wî nabihîzim.

Ji wê pê ve jî bêî ku ew bipeyive, ew demekê sekinî. Wê serê xwe bera ber xwe dabû. Lê sînga wê bi carekê ve ji ber îskînê hejiya. Îskînên wê dilê min perçe dikir. Ez qet ne li bendî bûm ku ew ê wilo dawî were. Min bi dengekî bi tirs û bi fedî got:

- Nastenka, ji bo Xwedê megirî!... Tu ji ku dizanî, belkî ew hê nehatiye...

- Na, ez dizanim, ew li vir e. Berî ku ew here bi şevekê, me ji hev re soz dabû. Min ji te re behs kir bê em li ser çi peyivîbûn. Em wê rojê hatibûn vir, em li vir meşiyabûn. Em li ser vê textebendê rûniştibûn, saet dehê şevê bû. Ez êdî nedigiriyam. Min bi şîrînî li gotinên wî guhdarî dikir... Wî got, gava ew ji Moskovayê vegere ew ê were mala me û ger ku ez wî red nekim



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ew ê her tiştî ji pîrka min re bibêje. Ez dizanim niha ew li vir, lê va ye ew nehat!...

Wê wilo got û dîsan giriya. Ez bi xemgînî ji cihê xwe pekiyam.

- Raweste cana min, em ê helbet riyekê ji vê liberketina te re bibînin! Binêre Nastenka, gelo ez bi xwe herime ba wî çawa ye?

Wê serê xwe bilind kir û li min nihêrî:

- Ma tiştên wilo dibe?

Min hebekî xwe da hev:

- Wilo ya, çênabe, min gotê. Ha, riyeke din jî heye. Ji wî re nameyekê binivîsîne.

- Ev qet çênabe, ez di jiyana xwe de nikarim tiştekî wilo bikim.

Lê ez li ser sekinîm.

- Çima çênabe? Name ji namê ferq dike. Tiştê pêwîst celebê nivîsandina wê ye. Ger tu bi a min bikî, ev fikreke baş e. Dîsan jî tu dizanî Nastenka, ez şîreteke xerab li te nakim. Wê her tişt têkeve rê. Li gorî ku te gava pêşî avêtiye, niha jî...

- Na, çênabe, ev dibe mîna ku ez bi zorê xwe dixime stûyê wî...

Êdî ez vekirî bişirîm:

- Ax, Nastenkaya min ya dilpak! Tu nerast difikirî. Ger wî ji te re soz dabe, wê çaxê heqê te heye ku tu li wî bigerî. Gorî ku min fêhm kiriye, ew ê peyayekî kubar be. Ew li hemberî te durust tevgeriyaye.

Her ku diçû, baweriya min bi rastiya fikrên ku min berpêş dikirin û bi mantiqiya delîlên min dihat.

- Ew bi rastgoyî tevgeriyaye. Xuya ye ku wî xwe bi soza xwe ve girê daye. Ger wî gotibe ku ew ê bi te re bizewice, ew ê bi te re bizewice û di ser re jî tu azad hiştiye, ma tu



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hê çi dixwazî? Wê çaxê tu dikarî pêşî dest bi vê meseleyê bikî. Ji ber ku mafê te heye. Ji ber ku tu bi awantaj î. Em bibêjin ku te mêrik nexwesta, wê çaxê te ê çi bikira?

- Çîk... ger tu bûya te ê çawan binivîsanda?

- Çi?

- Name, lo...

- Tu dizanî min ê çawan binivîsanda? Min ê pêşî bi "Mîrza" dest pê bikira.

- Gelo çênabe ku ez ne bi "Mîrza" dest pê bikim?

- Çênabe! Lê çima çênabe? Bi min bimîne...

- Ê, paşê?

- "Mîrza ez lêborînê dixwazim"... Na, na, ne hewce ye ku tu lêborînê filan bixwazî. Rewşa te ya biheq li navê ye. Tu dikarî nameyeke germ binivîsînî:

- Ez ji te re berê dinivîsînim. Li bêsebiriya min megire. Piştî ku ez salekê li bendî te mame, niha nikarim rojeke din jî bimînim, nizanim çiqas rast e. Erê, tu hatiyî vir, ma nabe ku tu fikra xwe biguherî? Tu maneya ku ez di nameya xwe de gazinan dikim, an jî te sûcdar dikim, dernexî. Ji ber ku min nikarîbû li dilê te hukum bikira, ez ê te sûcdar nekim. Ma ez çi bikim, qedera min wilo ye!

- Tu miroveki bi esil î. Ez hêvîdar im ku tu ê van çend rêzên ku bêsebiriyê bi min daye nivîsandin, di cih de bibînî. Vê jî ji bîr meke, ya ku ev nivîsandiye, yekî nêzîk ku ew pê bişêwire, tune ye. Vê jî ji bîr meke, ev name ji aliyê rebeneke ku nikare zora dil bibe, hatiye nivîsandin. Hema ji bo kurtedemekê be jî, ji ber vê şika ku ketuye hundurê min, min efû bike. Ez dizanim ku tu ê nikaribî yeka ku ji te hez kiriye û hê jî ji te hez dike, bişikînî.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Nastenkaya ku çavên wê ji kêfan diçûrisîn:

- Erê, tam mîna ez fikirî me! bi qêrîn got. Te hemû şikên min dane alî. Xwedê te ji min re şandiye. Ez spas dikim, pir spas dikim.

Min bi heyranî li rûyê keçikê yê şên dinihêrî.

- Tu çima spas dikî, Nastenka? Ma ji bo ku Xwedê ez ji te re şandime?

- Erê.

- Ax Nastenka! Em şikir dikin ku hin celebmirov di nava me de dijîn. Ez jî bi eynî dilşahiya te, bi dîtina te dilşa me.

- Baş e, wê bigihîje, bigihîje! Niha tu li min guhdarî bike. Soza me wilo bû: Çer ku ew ji Moskovayê vegeriyaya, wî ê nameyek bidaya yekî dilpak, ku ji çîrokê bêhay bû. Gelo ji ber zehmetiya di nameyê de nivîsandina her tiştî wî dev jê berda? Li gorî soza ku me ji hevdu re dabû, ew ê saet di dehan de bihata vir. Ez dizanim ku ew hatiye; lê digel ku sê roj di navberê re derbas bûne, wî ne nameyek şandiye, ne jî ew bi xwe hatiye. Bi rojan ez nikarim ji ba pîrka xwe bilivim. Ji ber vê yekê, tu vê nameyê bibe ji wî nasê min re. Ew ê ji navnîşana wî re bişîne. Ger bersiv were, tu sibehê saet di dehê êvarê de bîne vir.

- Baş e, lê name! Te hê name nenivîsandiye!... Ancax tu bersivê adinî rojê bistînî.

Mîna ku ew şaş mabû:

- Te got name? Erê, çîk...

Zimanê wê li hev geriya û sekinî. Wê rûyê xwe yê ku spîsor bûbû, bi aliyê din vekir. Min di wê navê de jî hîs kir ku wê zerfek xistiye nava destên min. Ev zerfa ha nameyeke ku berê hatibû nivîsandin û devgirtî bû. Di bîra min de rûyekî narîn û şên bi ruh dibû.

- R,o - Ro,s,î-sî,n,a-na! min dest pê kir.

Paşê me herduwan bi hev re got:

- Rosîna!

Min wextî ji kêfan ew hemêz bikira. Sorbûna rûyê wê hê derbas nebûbû. Gava ji bijankên wê yên reş hêsirên mîna înciyan dirijiya, ew dikeniya. Paşê wê zûka got:

- Eh, ew ê îro bigihîje. Di xweşiyê de bimîne! got. Name di destê te de ye, navnîşana ku tu ê bibiyê jî li ser nivîsî ye. Heydê, di xweşiyê de bimîne, em ê sibehê hevdu bibînin.

Wê bi herdu destê min girt û bi hemû hêza xwe guvaşt. Paşê wê bi serê xwe silav da û kete kuçeya mîna tîrekê. Min tibabekî li dû wê nihêrî. Gava ew di tariyê de ji ber çavan winda bû: "Erê, sibehê... heta sibehê! min di dilê xwe de got.

# Şeva Sêyemîn

Îro hewayek ne xweş, bi baran û keder heye; eynî mîna kalîtiya min ya pêşerojê - komek hîsên xerîb, fikrên reşbîn û pirsên ku ez nikarim ji xwe re şirove bikim, ji sibehê de serê min tev dide, lê bi qasî ku ez nikaribim vê zelal bikim, xwestekeke wilo jî hîs nakim. Ji xwe ma qey ez miroveki wilo me ku!

Em ê îro hevdu nebînin. Gava em do ji hev veqetiyabûn der û dor mij girtibû, asman bi ewran hatibû nixumandin. Min ji bo îro gotibû ku wê hewa ne xweş be. Lê Nastenka bersiv nedabû; mîna ku wê nedixwest ew ji kehaneteke xerab bipeyive. Ji bo wê do rojeke sayî û rohnî bû; tu ewran zora dilşahiya wê nedibir.

- Ger baran bibare, em ê nikaribin hevdu bibînim, wê gotibû. Ez ê nikaribim werim.

"Belkî Nastenka barana îro ferq nekiribe" ez fikirîm, lê ew bi rastî jî nehat.

Do hevdudîtina me ya sisiyan bû. Şevên me yên spî û sêyemîn bûn...

Xwedêyo, kêf û dilşahî mirovan çiqas xweşik dike, dilê mirov ji dilşahiyê çiqasî şêlav dibe! Te digot qey

ev şêlavbûna dil, ji bo ku mirov berde dilê hinin din, ji bo ku her tişt di kêf û şahiyê de bimîne, bikene, bireqise, bû. Bi rastî ez li dilşahiyeke wilo rast nehatime! Di gotinên Nastenka yên do de, li hemberî min dilovaniyî û nêzîkahiyeke mezin dihate fêhmkirin. Wê xwe nêzîkî min dikir, yeka min nedikir dido, ji bo ku ew xwe têxe çavên min, şaş bûbû bê ew ê çi bikira. Nazdariyeke wê ya dilşabûnê hebû. Ez... ez jî baweriya xwe bi van tînim, ya wê ku li hemberî min... Lê ez çawan wilo fikirî me? Mirovek nikare evqasî kor be, ku nebîne, ev hemû tişt ji bo hinin din têne kirin. Ew dilovanî, pûtepêdanî û hezkirin... erê, ji ber hezkirina min, dilşabûna wê ya hevdudîtina bi yekî din re, min çawan fêhm nekiriye ku ji dilşabûna ku bi min re bi par ve dike, tê.

Piştî sehinandina vala, gava mêrik nehat, Nastenka mirûzê xwe kir, veciniqî û bi tirs ket hev. Tevgera xwe, nazdariya peyva xwe ya berê, şênîtiya xwe ya pir winda kir. Ne ecêb e; ya ku esil bala wê kişande ser min, tirsa wê ya ku ew ê negihîje dilşahiyê bû! Nastenkaya reben; tirsa wê, ecêbmayîbûna wê ewqasî zêde bû, di dawiyê de têgihîşt ku ez ji wê hez dikim û di wê demê de jî gunehê wê bi hezkirina min ya xêrnedî dihat. Ma her tim ne wilo ye? Gava em xemgîn bin, em xemgîniya hinin din kûrtir hîs dikin. Hîs wan çaxan zirav û bi hêz dibin. Ez bê sebir li benda saeta hevdudîtinê bûm û ji bo dîtina Nastenkayê ez bi heyecan reviyam. Ma ji ku dihate bîra min ku ev hîsên min yên niha wê wilo bibin, û ev yeka han ne mîna ku ez dixwazim wê dawî were? Ji kêfan çavên Nastenka diçûrisîn û li hêviya bersivê bû. Bersiv ew hezkiriyê wê bû, ku ew ê bi banga wê re bi bazdan bihataya. Ew tam

saetekê berî min hatibû. Ew pêşî bi her tiştî, bi her gotinên min bi pîrqîn keniya. Gava carekê dît ku ez napeyivim,

- Tu dizanî bê ez çima evqasî dilşa me? Gava ez li te dinihêrim, dilşabûna min zêde dibe. Ez îro evqasî ji te hez dikim ku.

- Wilo ha? min gotê.

Dilê min bi lez lêdixist.

- Ji ber ku dilê te neketiye min, ez evqasî ji te hez dikim. Ger di şûna te de yekî din bûya, ew ê bela xwe di min bida, wê rehetî nedaya min; bi ax û oxan wê bi derewan rola dildaran bikira. Lê tu dostekî ji can î.

Wilo got û destê min ewqasî guvaşt ku wextî ez biqîriyama. Piştî ku ew demekê keniya, rûyê wê bi carekê ve cidî bû.

- Hem jî tu dostekî wilo ji can î, ku behskirina wê zehmet e. Xwedê te ji min re şandiye! Ger tu niha ne li ba min bûya, kî dizane bê ez ê têketima çi rewşê. Ya girîng tu ne menfeetperest î. Li hemberî min jî hezkirineke te ya pak heye. Piştî ku ez bizewcim jî, em ê dîsan dostên hev bin, dostên ku ji xuşk û biratiyê jî nêzîktir. Ez ê hema hema bi qasî ku ez jî wî hez dikim, ji te jî hez bikim...

Min di wê navê de xemgîniyeke bêhawe hîs kir, dîsan jî, li ku be, wextî ez bikeniyama.

- Nexweşiyeke te ya ruh heye, min jê re got. Bi fikra ku ew nayê, di hundurê te de tirseke ecêb heye.

- Bijî! Ger ez hê hindiktir dildar bûma, ez dikarîbûm ji ber bêbawerî û gazinên te bigiriyama. Lê... Çîk... ev fikra ku te xiste serê min, xuya ye wê min rehet nehêle. Neyse, ez ê paşê li van bifikirim. Ez çi derewan bikim, ya ku te gotibû rast bû. Erê! Mîna ku ez ne li ser hişê

xwe bûm, ez zipîziwa bûbûm; diltepîna min ji ber vê bû. Ooh, em niha dev ji mijara tirsê berdin.

Di wê navberê de dengê teperepa lingan hatin bihîstin, hew me dît ku yek di tariyê de ber bi me ve tê. Em herdu jî diricifîn. Nastenka ji bo ku negirî bi zorê xwe girt. Min destê keçikê berda, min xwest ez ji wê bi dûr bikevim. Lê em xapiyabûn, yê ku dihat ne ew bû.

Nastenka dîsan destê xwe dirêjî min kir:

- Tu çima tirsiya? wê ji min pirsî. Te çima destê min berda? Çi ji vê derdikeve? Em bi hev re herin pêşiya wî. Ez dixwazim ew bibîne bê em çiqasî ji hevdu hez dikin.

Min xwe negirt:

- Bila ew bibîne bê em çiqasî ji hevdu hez dikin!

Di wê navê de ez li van difikirîm:"Ax Nastenka, Nastenka! Ma tu dizanî bê tu bi van gotinên xwe çi dibêjî! Ma dihate hişê te ku hezkirineke wilo dilê yekî dike mîna qeşayê, ruhê yekî reş dike? Destê te mîna qeşayê ye, lê yê min ji german dişewite... Çavên te girtî ne, Nastenka! Ax, miroveke dilşa carinan çiqas zehmet dibe! Lê ji te hêrsbûn ne di destê min de ye.

Min ê zêdetir debar nekira.

- Ez ji te re behs bikim bê îro çi bûye?

- Çi bûye? Ma tiştek bûye? Heydê behs bike! Çima tu ji mêj ve bêdeng î?

- Min pêşî ew karê ku te dabû min, kir. Min çû ew nameya han da nasên te. Dû re jî gava ez vegeriyam malê, ez razam.

Nastenka bi kêf peyva min birî:

- Hemû ev bû?

Min hîs kir ku di çavên min de hêsirên ehmeq çêdibin, min ne ji dil got:

- Hema hema evqas. Ji hevdudîtina me re çend saet mabûn ku ez şiyar bûm, te digot qey ez qet ranezabûm. Ez nizanim çi bi min hat. Gava ez hatim, min dixwest ez ji te re behsa van bikim.

Dem rawestiyabû, di wê navê de mîna ku hîsên di hundurê min de bêdawî bûbûn, mîna ku wê dem heya bêdawiyê biçe û min hîs dikir ku wê jiyan ji bo min raweste. Gava min çavên xwe vekirin, straneke xweş, mîna ku min ji mêj ve bihîstibe, ji ber kiribe û paşê ji bîr kiribe, di guhên min de dihate gotin. Ev straneke wilo bû, ku heya ez li jiyanê bim, dixwest ji ruhê min biqete û here, wê niha firsend dîtibû...

- Pir ecêb e! Ev tiştekî çilo ye? Min ji vê tiştek fêhm nekir.

- An na min çiqasî dixwest ku ez ji te re behsa vê hîsa ecêb bikim, Nastenka!

Ji dengê min yê bi bergerîn, hêviyeke jar û veşartî dadiwerivî. Ax, Şeytan! Wê tavilê fêhm kiribû.

- Bes e, niha dev ji van berde, got.

Ew di wê navê de jî kete hewayeke şên û kete milê min. Ew bêî navbir dikeniya û dixwest ez jî bikenim. Her gotina ku min bi şermokî digot, wê bi hîke hîk dibersivand... Tam ez wextî hêrs bibûma, vê carê jî wê nazê xwe kirin.

- Binêre bê ez ê ji te re çi bibêjim. Ji bo ku dilê te neketiye min, ez hebekî li ber xwe dikevim. Mirov çi benderuhên ecêb in, ne wilo ? Lê, ey dostê min, yê serbilind, tu nikarî bibêjî ji ber ku ez keçikeke saf im tu min naecibînî. Ji ber ku ez ji te re her tiştî, her fikrên pûç jî, yên ku di hişê min de derbas dibin, dibêjim.

- Ka raweste, ez bawer im zengilê saeta yanzdehan lêdikeve!

Ji derveyî bajêr, dengê zengilê dêrekê bi pîvan û gurr dihat. Nastenka bi carekê ve sekinî. Wê dev ji kenê xwe berda û lêdanên zengil hejmartin. Paşê bi dengekî bi tirs û bê biryar got:

- Erê, yanzdeh.

Ez di wê navê de poşman bûbûm ku min ew tirsandibû û lêdanên zengil bi wê dabûne hejmartin. Û ji bo ku kîna min zora min biribû, min nalet li xwe anî. Bi xemgîniya keçika reben re, ez li riyên lêbûrîna qusûra xwe digeriyam. Ji bo ku ez dilê wê têxim cih, min delîlên cihê, sedemên nêzîkî aqilan, jê re tanîn, û jê re şirove kir ku bê ji bo çi mêrik nehatiye. Di wê navê de, tu kes weke Nastenka bi hêsanî nedihate xapandin. Her kesê ku di eynî rewşê de ye, ji gotinên xapînok ku têne gotin, bi qasî serê derziyê ger rastiyekê tê de bibînin, ew xwe bi ruh û can lê dipêçin.

Ez bi xwe jî dibûm heyranê şirovekirina delîlên ku min berpêş kiribûn, her ku çû ez bi dengê bilind dipeyivîm.

- Ya rastî em mirovên ecêb in! Ca bifikire, ew ê çilo bihata! Nastenka, we ez xapandime û we serê min wilo tevlihev kiriye, ku min hesabê demê jî ji bîr kiriye. Dibe ku wî hê nû name girtibe. Paşê, belkî ji bo ew nikare were, ew difikire ku bersiva nameya te bide. Ji xwe name berî sibehê nayê. Ez ê sibehê zû lê binihêrim û tavilê haya te bigihînimê. Her tişt tête bîra mirov. Ser qisê, dibe ku name jê re here û ew ne li mal be. An jî dibe ku hê name negihîştibe destên wî. Her tişt dibe...

- Rast e, ez li van nefikirî bûm. Bêşik her tişt dikare bibe.

Nastenka ev bi dengekî mulahîm gotibû. Lê ew mîna dengekî derizî ku rîtma muzîkê xerab dikir, mêjiyê fi-

kreke veşartî û jar tevlihev dikir, bû.

Wê peyva xwe domand:

- Tu dizanî tu ê sibehê çi bikî? Heta ku ji te tê tu sibehê zû here wir, ger bersivek hatibe, tavilê ji min re bîne. Ji xwe tu dizanî bê ez li ku rûdinêm.

Nastenka careke din jî navnîşana xwe jê re got. Jê pê ve jî ew ket rewşeke tirsê û şelafî bû. Mirov digot qey ew bi dîqet li min guhdarî dike, lê ez nizanim bê çawan bû; min pirsek ji wê pirsî bû, wê bersiva min neda, wê xwe şaş kir û serê xwe bi aliyekî ve xwar kir. Ez lê zîvirîm û min li rûyê wê nihêrî; tam mîna ku ez fikirîbûm, ew digiriya.

- E, ev çi ye? Wele tu hê mîna zarokan î!... Heydê, vî giriyê xwe bibire!

Nastenka hewl da ku bibişire û bêdeng bibe, lê çenga wê dilerizî, sînga wê radibû û dadiket. Piştî ku demekê bêdeng ma:

- Ez li te difikirim, divê mirov kevir be, ku nizanibe bê tu mirovekî çiqas qenc î. Tu dizanî bê çi hate bîra min? Min hûn dane ber hev. Çima ew ne tu yî? Çima ew li te neçûye... Digel ku ez bêtir ji wî hez dikim, lê tu ji wî çêtir î.

Min bersiv neda. Mîna ku wê dixwest ez tiştekî bibêjim.

- Belkî min ew baş fêhm nekiribe, belkî ez wî baş nas nakim. Çi ecêb e, ez hebekî ji wî ditirsiyam; ew sergiran û bi gurûr dixuya. Bêşik, digel ku ew wilo dixuya jî, dilê wî ji yê min teniktir bû. Gava min rahişt buxçuka xwe û ez çûme oda wî, ez di heyatê de wan nêrînên wî ji bîr nakim. Dîsan jî li hemberî wî hurmeteke min ya mezin heye. Gelo ma ev ji bo ku ez xwe kêmî wî dibînim e?

- Ne wilo ye, Nastenka, tu şaş î. Ji ber ku tu wî li dinyayê ji her tiştî, heta ji xwe bêtir hez dikî, ji te re wilo tê.

- Baş e, bila wilo be, Nastenka bi dilpakî got. Binêre, niha tiştek hate hişê min: Em êdî hew behsa wî dikin. Baştir e em li ser tiştin din bipeyivin. Tiştek heye ku ji mêj ve serê min tev dide. Ji bo çi mirov li hemberî bi durustî tevnagere? Ji bo çi mirovên herî baş jî tiştinan ji yê li hemberî xwe vedişêre, hemû tiştê ku ew difikire nabêje? Çima em rastiya tiştên ku di hundurê me de derbas dibin, nabêjin? Çawa be her kes dixwaze ji rastiya xwe serttir be. Gava ew hîsên xwe biavêjin navê, ew ditirsin ku ew ê di bin de bimînin, ew ê biçûk bikevin.

Ji ber ku min jî di wê navê de, ji her car bêtir hîsên xwe bindest hiştin, min peyva wê birî:

- Tu rast dibêjî, Nastenka. Lê sedemên vê yên pirtexlît hene.

Nastenka pir bi heyecan bû:

- Lê her kes ne wilo ye! Wek mînak, tu...Tu naşibî kesekî din. Ez nizanim çilo ji te re behs bikim... Bi min wilo tê ku, tu... Niha jî...Tu hin tiştan ji bo min ji xwe didî...

Nastenka di bin çavan re bi tirs li min nihêrî û peyva xwe domand:

- Ji bo ku ez wilo dipeyivim li qusûra min nenihêre. Ez keçikeke nexwendî me, zêde neketime nava mirovan. Ji ber vê yekê ez carinan nizanim bipeyivim jî.

Dengê wê ji ber îhtiraseke bi dizî dilerizî, lê dîsan jî wê hewl da ku ew bibişire.

- Tiştê ez dixwazim bibêjim ev e, ji bo wan hîsên ku tu li hemberî min hildigirî, ez spasdarê te me... Xwedê

dilşahiyê bide te! Tiştên ku te do di derheqa xeyalperestiya xwe de gotibûn, yek ji wan jî ne rast e.Yanî têkiliyên van gotinan zêde bi te tune ne. Tu dikarî ji xeyalan rizgar bibî. Tu ne mîna wî mirovê ku te wê rojê behsa kiribû.Tu ê rojekê hez bikî, hêvîdar im tu ê bi hezkiriya xwe re dilşa bî. Tu xwestekên min yên wilo ji bo wê keçikê tune ne, ji ber ku çawa be, ew ê bi te re dilşa bijî. Ez vê yekê bi zanebûn dibêjim, ez jî jinek im, wê çaxê tu baweriya xwe bi gotinên min bîne...

Nastenka haş bû, destê min bi hêz guvaşt. Ez ji heyecanan nikarîbûm bipeyiviyama. Çend deqîqe wilo derbas bûn. Wê, paşê serê xwe rakir:

- Erê, gorî ku dixuye ew ê îro neyê! Pir dereng bûye.

Bi dengekî bi bawerî û bi biryar:

- Ew ê sibehê were, min got.

Rûyê Nastenka şên bû.

- Erê, êdî ez jî mîna te difikirim; ancax ew bikaribe sibehê were. Eh, di xweşiyê de bimîne! Em ê sibehê hevdu bibînin. Ger baran bibare, dibe ku ez neyêm. Lê roja piştî wê, çi dibe bila bibe, ez ê ji sedî sed werim. Tu jî nebêje ez nayêm. Pir tiştên ku ez ji te re behs bikim hene.

Wê çavên xwe yên rohnî berdan çavên min û destê xwe direjî min kirin.

- Em ê êdî her tim bi hev re bin, ne wilo?

Ax, Nastenka, ger te niha bizanîba bê ez çi tenêtiyê hîs dikim!

Gava saet bû neh, êdî ez nikarîbûm di odeya xwe de rawestiyama. Bêî ku ez guh bidim nexweşbûna hewayê, ez derketim kuçê. Piştî kurtedemekê ez li ser textebendê me rûniştibûm. Carekê min got ez herim mala Nastenka, lê gava ez ketim kuçeya wan û bi tenê çend

gav mabûn ku ez bigihîştama mala wan, min şerm kir, bêî ku ez serê xwe rakim, ez dîsana berepaş vegeriyam. Gava ez vegeriyam malê, bêhntengiyeke ku min heta niha netamandibû, dilê min dagirtibû. Digel vê jî rewa û mirûziya hewayê hebû. Qet nebe, hewa xweş bûya, min ê dema xwe bi gerê derbas bikira, ez venedigeriyam malê.

Ez çi bikim, ez ê li hêviya sibehê bimînim. Wê Nastenka sibehê behsa her tiştî, her tiştî bike.

Lê name? Îro name jî tune bû! Lê çi lazim e? Êdî ew gihîştine hev.

# Şeva Çaremîn

Xwedêyo, ma wê her tişt wilo dawî bihata, ma wê dawî wilo bibûya?

Ez saet di nehan de hatim. Nastenka li wir bû. Gava min ji dûr ve lê nihêrî, rawestandina wê ya roja pêşî hate bîra min. Wê dîsan wilo xwe spartibû hesinê pirê. Digel ku ez baş nêzîkî wê bûm jî wê ez ferq nekirim.

Min hemû hêz û heyecana xwe nîşan da:

- Nastenka!

Ew bi carekê ve li min zîvirî:

- Ka bide! Tu çi sekinî yî?

Min bi matmayî li wê nihêrî.

- Kanî? Name li ku ye? Ma te name neaniye?

Ez şaşmayî mabûm.

- Name bi min re nîn e!... min gotê. Ma we hê hevdu nedîtiye?

Rû pê ve nema; çavên wê li min bû û di cihê xwe de sar ma. Hêviya wê ya dawî jî min şikandibû. Dawî bi dengekî qurmiçî:

- Eh, ma em çi bikin? Tiştekî ku em bikin tune ye. Dêmeg wî rûyê xwe ji min bada ye. Wê çavên xwe bera jêr dan, paşê xwest li min binihêre, lê nikarîbû.

Herçiqas wê xwest di wan çend deqîqeyan de zora hey-ecana xwe bibe jî, dawiyê debar nekir, berê xwe guhert, xwe sparte şîşên pirê û bi îskînî giriya.

- Dev ji vî giriyê xwe berde, min gotê.

Lê gava min li rûyê keçikê nihêrî, min fêhm kir ku ez ê nikaribim peyva xwe bidomînim. Ma min dikarîbû ji wê re bigota çi!

Ew bêî rawestan digiriya.

- Min mexapîne! careke din behsa wî meke!

Wî ez bi bêwijdanî û bêînsafî hiştime. Tu jî vê yeka han nabînî û tu hê jî dibêjî, ew ê vegere! Lê çima? Wî çima wilo kir? Gelo ma di nameya min de, di nameya min a bêyom de tiştekî xerab hebû?

Ji ber îskîna wê peyva wê dihate birîn. Gava min li wê dinihêrî, dilê min perçe dibû.

- Ew çiqas bêwijdan û xedar e. Wî rêzek jî, bi tenê rêzek jî ji min re nenivîsand. Çi dibe, bila bi rêzekê du rêzan bidaya xuyakirin ku ew ji min hez nake, ew min naxwaze. Lê ev sê roj in xeber ji wî tune ye. Xuya ye ji bo wî gelek hêsan e, ku ew keçikeke bêsûc, ku tenê ji wî hez dike, biçûk bixîne, wê biqeherîne. Bi tenê Xwedê dizane ku ev sê roj in, bê ez çi dikişînim. Gava ez difikirim, ku ez bi lingên xwe çûme ba wî, bêî ku ez guh bidim biçûkdîtina xwe, ji bo ku ez hebekî bê me hezkirin, gava ez li wan hîsên ku min rijandine difikirim, ez qehir dibim. Ev e, tu rewşa min dibînî...

Nastenka bi carekê ve berê xwe bi min vekir. Ji çavên wê yên reş birûsk pêdiket.

- Tiştê wilo nabe! Tiştê wilo di dinyayê de nabe. Ev rewşeke ecêb e! Ya ez şaş im, yan jî tu. Dibe ku jî nameya min negihîştibe wî, ne wilo? Belkî haya wî ji tu tiştî tune ye. Çi dibe, tiştekî bibêje, ger tu tiştekî ji vê

fêhm dikî ji min re bibêje. Çawa dibe ku ew dikare evqasî hov û bêwijdan be? Wî gotinek jî nenivîsand. Yek li hemberî mirovên herî neqenc jî wilo tevnagere. Gelo di derheqa min de tiştekî ne li rê bihîstiye? Belkî hinan ji wî re paşgotiniya min kiribin. Bibêje, tu di derheqa vê de çi difikirî?

- Guh bide min Nastenka, ez ê li ser navê te sibehê herim ba wî.

- Paşê?

- Ez ê rewşa wî hîn bibim. Ez ê jê re behsa her tiştî bikim

- Wekî din?

- Tu niha nameyekê binivîsîne. Nebêje nabe, Nastenka. Tu bi a min bike. Tu ê bibînî ku ew ê bi hurmetgirî xwesteka te qebûl bike. Ger...

Nastenka bi carekê ve peyva min birî:

- Na dostê min, çênabe. Êdî bes e. Ji niha û pê ve êdî ez gotinekê, ez rêzekê jî jê re nanivîsînim! Ez êdî wî nas nakim, ez ji wî hez nakim... Ez ê wî ji bîr bikim!

Min ew li ser bankê da rûniştandin:

- Ewqasî li ber nekeve, min gotê. Li vir rûnê.

- Tiştekî ku ez li ber bikevim tune ye, bes e êdî. Tu guh mede giriyê min, wê derbas bibe! Ma qey tu difikirî ku ez tiştekî bi xwe bikim, ez xwe bikujim?

Dilê min bi wê şewitî. Min dixwest ez bipeyivim, lê min nikarîbû.

Nastenka bi milê min girt:

- Guh bide min, ger tu bûya te wilo nedikir, ne wilo? Keçika ku bihata ber lingên te, te ew wilo nedihişt, ne wilo? Te qeşmeriyên xwe bi dilê wê yê jar û dêhnik nedikir.

Ji ber ku ew keçikek ku bi xwe nikarîbû û nikarîbû

xwe biparasta û ku te bidîta ew nikare zora dilê xwe bibe, wê gunehê te bi vê keçika bêsûc bihata, ne wilo?

Oh, Xwedêyo! Ev çi ye hatiye serê min!

Ji ber ku min nikarîbû ez hê bêtir zora heyecana xwe bibim:

- Nastenka, Nastenka! min bang kiriyê. Tu îşkencê bi min dikî! Tu dilê min perçe dikî, tu ezabê mirinê bi min didî kişandin! Ez êdî nikarim her tiştî biavêjim hundurê xwe. Ger ez li ser tiştên ku di hundurê min de gihane ser hev nepeyivim, ez debar nakim.

Piştî ku min ev gotin, ez rabûm ser xwe. Nastenka bi destê min girt û bi şaşmayî li rûyê min nihêrî:

- Çi bi te hatiye? wê got.

- Guh bide min Nastenka! Tiştê ez ji te re dibêjim, dikare gotinên çewt û ne li rê bin. Digel ku ez dizanim wê tiştekî wilo nebe jî, dîsan ku ez nepeyivim, ez xwe nagirim. Ji bo xatirê yê ku tu di riya wî de êşê dikişînî, li min bibûre!...

Nastenka lawija (dûrika) xwe birî. Di çavên wê yên matmayî de ku berdabûn çavên min, biriqandineke ecêb ya meraqê hebû.

- Ew tiştê ku tu ê bibêjî çi ye?

- Tiştekî ku wê nebe, lê, ez ji te hez dikim Nastenka! Hemû ev bû! Ka em binêrin bê ji niha û pê ve tu ê wekî berê bi min re bipeyivî û li min guhdarî bikî an na?

Nastenka peyva min birî:

- Çi bû ye ku? Ma çi di vê de heye? Min ji mêj ve dizanîbû ku tu ji min hez dikî, lê ne evqasî, min texmîn dikir ku tu hindikî ji min hez dikî... Dêmek ne wilo ye!

- Di destpêkê de jî wilo bû Nastenka! Lê belê niha, niha... Ez jî niha, mîna gava tu bi buxçika xwe çûbûyî

ba wî me... Heta hê jî xerabtir, Nastenka. Ji ber ku yeke ku wî jê hez dikir tune bû, lê yê te heye.

- Tu çi dibêjî? Ez tênagihîjim bê tu dixwazî çi bibêjî. Tu çima wilo, hem jî ji nişka ve... Xwedêyo! Ez ji ehmeqî diaxivim, lê tu...

Nastenka şaş û ecêbmayî mabû. Rûyê wê sor bûbû û çavên xwe berdabûn çavên min.

- Ez niha çi bikim? Tu bibêje! Ez dizanim ku ez sûcdar im. Min baweriya te bi xerabî bi kar anî... Lê na, Nastenka, ez ne sûcdar im. Dengek ji nava min wilo dibêje, ez hîs dikim, ku ez rast im. Ji ber ku ez nikarim te bi tu celebî biqeherînim, an jî biêşînim. Ez dostê te bûm, ez dîsan dostê te me. Tiştekî ku hatiye guhertin tune ye. Ev e, binihêre, Nastenka, hêsirên min diherikin. Bihêle bila biherikin, ma zerara wê digihîje kesî? Çawa be ew ê ziwa bibe...

Wê hewl dida ku ew min li ser bankê bide rûniştandin.

- Rûnê canê min, rûnê, tu bala xwe bide vî îşî!

- Na. Nastenka, ez ê rûnenêm. Ez êdî nikarim li vir bimînim. Tu ê ji niha û pê ve hew min bibînî. Tiştên ku ez dixwazim ez ê bibêjim û ez ê paşê herim. Gotina min ev e, Te ê tu caran fêhm nekira ku ez ji te hez dikim. Min ê sirra xwe ji xwe re veşarta. Diviya bû min di demeke wilo de tu bi ezîtiya xwe xemgîn nekiriba. Lê ji ber ku te mijar vekir, sûc ne yê min e, yê te ye... Mafê te tune bû ku te ez ji ba xwe biqewirandima...

Heta ku ji Nastenka dihat wê dixwest ku şerma xwe veşêre:

- Kê tu qewirandiye? got. Ez te naqewrînim ku!

- Dêmek tu min naqewirînî? Ji xwe ez ê bi xwe biçûma... Ez ê dîsan jî nesekinim. Ez dixwazim pêşî

hundurê xwe vala bikim. Berî bi kêliyekê tu digiriya, te bi dilşewatî gazin dikir. Ji ber ku... Ji ber ku ( ez ê vekirî bibêjim) wî evîna te red kir, wî tu bi tenê hişt. Min nikarîbû ev qebûl bikira Nastenka, Dilê min li hemberî te bi hezkirineke wilo mezin tijî bû, ku ez nikarîbûm li cihê xwe bêdeng rûniştama. Lê gava min didît ku ev hezkirina min jî bi kêrî tiştekî nayê, ez xemgîn dibûm. Ma di vê rewşê de ku ez nepeyivim, çêdibe, Nastenka? Min debar nekir, min her tişt got.

Di rûyê Nastenkayê de liveke armanc nediyar hebû.

- Bila be, bibêje, her tiştî bibêje. Wê ev xwesteka min bi te ecêb were... Dîsan jî bibêje, bipeyive. Ez ê paşê ji te re bibêjim, bê ez ji bo çi wilo dixwazim. Ez ê ji te re her tiştî bibêjim.

- Gunehê te bi min tê Nastenka. Gelo ma ji bilî vê tiştekî ku tu bixwazî bibêjî heye? Tiştên çûne çûne, tiştên hatine gotin hatine gotin; gotinên ku ji dev derdikevin bi paş ve venagerin. Ji ber ku tu êdî bi her tiştî dizanî, em ê ji vir dest pê bikin. Gava tu berî niha bi demekê digiriyayî, ez xwe bi xwe difikirîm ku... Erê, min çi digot. Ha, ez xwe bi xwe difikirîm ku... Ne tiştekî ku her dem dibe ya... Ez fikirîm ku ji ber hin sedeman tu dikarî ji wî hez nekî. Ez do jî li vê yeka han fikirîm, îro jî, Nastenka. Ji ber vê yekê min çi bikira jî, diviya bû min xwe bi te bidaya hezkirin. Ji ber ku te bi devê xwe got ku, te êdî dest pê kiriye û ji min hez dikî. Ev e, tiştên ku min dixwestin ez bibêjim, kêm zêde ev in. Ha, tiştekî din jî heye: Ez dixwazim vê jî bibêjim; ger te ji min hez bikira, me ê çi bikira. Li min guhdarî bike, dosta min - ji ber ku tu hê jî dosta min î - ez mirovekî basît, belengaz û reben im. Di eslê xwe de ya giring ne ev e. Ji ber ku min xwe şaş kiriye ez van gotinan di devê

xwe de dibim û tînim. Çawa be, em dev ji van berdin. Tiştê ez dixwazim bibêjim ev e, ger tu ji vî peyayê ku ez nas nakim, hez bikî, ger tu hezkirina xwe bidomînî, ez ê dîsan mîna dêhnan ji te hez bikim, lê ji bo ku hezkirina min ji te re nebe bar, tiştê ku ji destê min bê ez ê bikim. Te ê bi tenê ev fêhm bikira û bizanîba ku; her tim li ba te dilekî ku ji bo te lêdixe, tijî minet û germ, heye. Hem dilekî wilo ye ku... Ax, Nastenka, Nastenka!... Te ez xistime çi rewşê!...

Nastenka ji ser bank hol bû,

- Megirî, ez naxwazim ku tu bigirî, got. Heydê, em ji xwe re hebekî bimeşin. Giriyê xwe bibire êdî.

Wê destmala xwe derxistibû û hêsirên xwe pakij dikir.

- Baş e, em niha dikarin herin. Belkî tiştekî ku ez jî ji te re bibêjim heye. (Ez qet naxwazim te bixapînim) digel ku ez hê jî ji wî hez dikim, mafir wî dev ji min berdaye, wî ez ji bîr kirime... Erê, mafir... Çîk... bersiv bide min: Em bibêjin ku min jî ji te hez bikira, bi tenê ji te... Ax dosto! Ez niha fêhm dikim, ji bo ku tu ne dildarê min bû, min tu diêşand, min henekê xwe bi te dikir. Ax, ez çi bêaqil bûme. Çawan ez nikarîbûm bifikiriyama, çawan min nikarîbû texmîn bikira! Min êdî biryara xwe daye, ez ê her tiştî bibêjim...

- Li min guhdarî bike, Nastenka! Çi dibe, ez herim. Ji ber ku ez bi tenê êşê didime te. Binihêr, ji bo ku te tinazên xwe bi min kirine, tu niha ezabê wijdan dikişînî. Lê ez tiştekî wilo naxwazim, ev hemû sûcê min e, Nastenka. De, di xweşiyê de bimîne.

- Ka raweste, li min guhdarî bike! Ma tu nikarî hebekî rawestî?

- Ez ê li benda kê, ji bo çi rawestim?

- Ez ji wî hez dikim, lê ev ê derbas bibe, divê derbas bibe, derbasnebûna wê ne mumkun e. Niha jî ez hîs dikim ku derbas bûye... Dibe ku îro dawî were. Tu dizanî çima? ji ber ku ez ji wî nefret dikim, gava tu li vir, li ba min digirî, wî tinazê xwe bi min dikir. Paşê te, mîna wî ez bi tena serê xwe nehiştime. Ji ber ku tu ji min hez dikî, lê ew nizane bê hezkirin çi ye. Ez jî, ji te hez dikim. Hem jî bi qasî ku tu ji min hez dikî... Min berê jî ji te re gotibû, ji ber ku tu ji wî çêtir û bi esiltir î ez ji te hez dikim. Ji ber ku ew...

Heyecana keçika reben gihîştibû dereceya dawî. Berî ku ew peyva xwe biqedîne, wê serê xwe danî ser milê min, paşê jî danî ser sînga min; bi dilşewatî giriya. Tiştên ku min ji bo aşkirin û rawestandina giriyê wê gotin, hemû jî bertelaf çûn, giriyê wê qet nedisekinî. Wê bêî navbir destê min dişidand, di nava îskînên xwe de car bi car dipeyivî.

- Hebekî raweste, wê niha derbas bibe. Ez ê tiştekî ji te re bibêjim, nebêje qey ev hêsir ji ber tiştekî din e... Ji hesasiyetê ye. Ew ê niha raweste.

Dawiyê giriyê wê sekinî, wê çavên xwe pak kirin û em dîsan meşiyan. Min dixwest ez bipeyivim, lê her carê Nastenka lava dikir ku ez hebekî din jî rawestim. Em bêdeng dimeşiyan... Dawî dawî ew bi ser xwe ve hat û dest bi peyvê kir. Dengê wê yê jar û lerzokî pir tesîr li min kir û dilê min êşand.

- Çi dibe, tu min mîna keçikeke sivik nebîne. Ez ne ji wan kesên ku zû ji bîr dikin û xiyanetê dikin. Min tam salekê ji wî hez kiriye, ez bi navê Xwedê sond dixwim ku xapandina wî rojekê jî di serê min re derbas nebûye. Lê tişt nabe, wî ez bêqîmet dîtim û henekê xwe bi min kir, Xwedê qusûra wî efû bike. Bi êşandina min,

bi şikandina dilê min çi fêda wî çêbû? Hîç!...Ez êdî ji wî hez nakim. Ez ancax bikaribim ji yekî dilberz û bi esil hez bikim. Ji ber ku ez jî wilo me, ew ne layiqî min e. Xwedê kêmasiyên wî efû bike. Ji berdêla ku ez ê bi derengî bi xapandina xwe bihesim, wilo çêtir e. Ez êdî wî nas dikim. Êdî dawiya hemû tiştî hatiye...

Nastenka destê min şidand û dom kir:

- Paşê, tiştekî din jî heye, dostê min. Dibe ku evîna min ya li hemberî wî ji xapandineke hîsî û ji xeyalan pê ve ne tiştekî din be. Belkî ji aciziyeke ku ez ji ber çongên pîrka xwe neqetyabim be. Diviya bû peyayê ku min jê hez bikira cihê bûya. Erê, diviya bû min ji yekî ku gunehê wî bi min bihata hez bikira... de em vê mijarê bigirin.

Nastenkaya ku kirî ji heyecanan bifetisiya, hebekî sekinî.

- Binêre, tiştê ku ez dixwazim ji te re bibêjim ev e: Digel ku tu dizanî ez ji wî hez dikim - min bi rastî jê hez kiriye - ger tu hê jî ji min hez dikî... Ez çawa bibêjim, ger tu hîs dikî ku evîna me gelekî bi hêz e, bi qasî ku bikaribe yê din ji dilê min bi dûr bixe... Ger wê gunehê te bi min were û tu ê nehêlî ku ez di jiyanê de bi tik û tenê, bêhêvî, bêaşkirin û bi qedera xwe re bi tenê bimînim... Ger tu ê her dem mîna niha ji min hez bikî, bi soz ez spasdar im... Çîk... wê evîna min layiqî evîna te be. Tu destê min dixwazî?

Min nikarîbû hêsirên çavên xwe yên dilşahiyê bigirtana.

- Nastenka! Ax, Nastenka! min bi qêrîn got.

Wê jî bi zorê xwe digirt.

- Eh, ewqas bes e! Ez bawer im her tiştên ku wê bihata gotin, hatin gotin. Em herdu jî dilşa ne, ne wilo? Wê

çaxê em vê mijarê bigirin, em behsa tiştin din bikin.

- Erê, Nastenka, wilo ye. Bila ev mijar bête girtin. Ez pir dilşa me. Ger êdî em derbasî mijarin din bibin wê baş bibe. Ê min ez hazir im.

Lê me nizanîbû bê em ê li ser çi bipeyiviyana. Em dikeniyan, digiriyan, me henek û qeşmeriyên bêhawe dikirin. Carna em di ber dikanan re dimeşiyan, carna jî em derbasî hember dibûn û li wir digeriyan, paşê em dîsan vedigeriyan cihê xwe yê kevin û em ji xwe re dimeşiyan. Em mîna zarokan dilşa bûn...

- Ez niha bi tena xwe me, Nastenka, lê di pêş de... Tu dizanî, ku ez miroveki xwedî hatineke kêm im. Salê hezar û du sed ruble dikevin destê min, lê ne xerab e.

- Ji xwe ne xerab e. Paşê hatina pîrka min ya jinebîtiyê jî heye. Ew ji me re nabe bar. Em ê wê bibin ba xwe.

- Ji xwe em ê wê bibin ba xwe. Ma em wê nebin dibe! Lê ev Matriyona me...

- Erê, a me jî Fiyolka me heye...

- Matriyona jineke baş e. Kêmasiyeke wê heye, ew jî serê wê vikî vala ye, hişê wê nagihîje tiştekî. Lê ev ne girîng e...

- Çi ferq dike canê min! Ev nabe sedema ku ew li hev nekin. Divê hûn sibehê tavilê bar bikin ba me.

- Çawa, em ê çawa bar bikin ba we?... Ji bo min ferq nake...

- Erê, hûn ê bibin kirêdarê me. Odeya jor vala ye. Pîrejineke esilzade lê dima. Ez dizanim ku pîrka min kirêdarekî ciwan dixwaze. Min jê pirsî "Tu ji bo çi yekî ciwan dixwazî?" "Ji ber ku ez pîr bûme, tu nefikire ku ez ji te re li mêran digerim" wê li min vegerandibû. Lê ez tavilê têgihîştim ku ji bo vê yekê ye.

- Ax, tu heye ya!

Em herdu jî keniyan

- Eh, temam! Kenê me bes e!... Tu li ku rûdinişt? Min ji bîr kir.

- Li ba pîra X'ê, di xaniyê Barannikov de.

- Maleke wilo mezin e?

- Erê, mezin e.

- Ez dizanim, ew maleke xweş e. Êdî hûn dev ji wir berdin û rojekê berî rojekê bar bikin xaniyê me.

- Derengtir sibehê, Nastenka. Ez hebekî deyndarê kirê me, lê xem nake... Çawa be ez ê di nêzîk de mehiya xwe bistînim.

- Belkî ez jî dersan bidim. Ez ê pêşî hîn bibim, paşê jî hînî hinin din bikim.

- Pir baş e, Nastenka. Tu dizanî, ez ê di nêzîk de îkramiyê bistînim.

- Dêmek tu ê ji sibehê û pê ve bibî kirêdarê min.

- Erê. Binêr, ew ê Berberê Sevîlayê dîsan bileyize, em dikarin bi hev re herin bibînin.

Nastenka keniya.

- Em ê herin, lê ne Berberê Sevîlayê, em herin tiştekî din bibînin.

- Baş e, tiştekî din... Bêşik wilo çêtir e, bêî ku ez zêde lê bifikirim min ew got.

Em ji xwe re wilo dipeyivîn û dimeşiyan. Te digot qey em ji xwe çûbûn, me ferq nedikir ku em li ku dimeşiyan jî. Em carna disekinîn, em li eynî cihî demeke dirêj dipeyivîn, paşê em dîsan dimeşiyan, em têê diçûn cihên dûr, em di nava hêsirên çavan de bi hîke hîk dikeniyan.

Nastenka carna dixwest here malê, ez jî ji wê re nedibûm asteng, min ew dibir heta ber mala wê, lê piştî

çarîkekê me dîsan dinihêrî ku em li rihtima xwe, li ser bankê xwe ne. Carna jî gava Nastenka bêhna xwe berdida, çavên wê tijî hêsir dibûn. Wê çaxê tirsekê ez digirtim, ez dibûm mîna qeşayê. Lê wê tavilê bi destê min digirt û ez dibirim deverên dûr. Me wilo dîsan dest bi henek û qeşmeriyan dikir û em digeriyan.

Dawî Nastenka;

- Em êdî herine malê, got. Dem dereng e. Evqas şeytaniyên ku me kirin bes e.

- Tu rast dibêjî Nastenka. Lê ez êdî hew dikarim razêm. Ez naçim malê.

- Ez bawer im ez ê jî nikarim razêm. Dîsan jî tu min bigihîne malê.

- Ez ê te bi kêfxweşî bigihînim malê!

- Lê em ê vê carê bi rastî herine mal.

- Tu qet meraqan meke.

- Bi soz? Ji ber ku çawa be ez ê herime mal.

Bi ken,

- Bi soz, min gotê.

- Wê çaxê heydê.

- Baş e... Li esmên binihêre Nastenka. Wê sibehê roj gelekî xweş be, wê asman çiksayî be, wê heyv şewq bide. Tu bala xwe bide vî ewrê zer, tu nemaye ku ew heyvê bigire. Binihêr, binihêr... Lê di rex wê re derbas bû... Tu dibînî, Nastenka?

Lê Nastenka li heyvê nedinihêrî. Ew nedipeyivî, mîna kevirekî li ba min sekinî bû. Piştî demekê, ew bi tevgereke bi tirs û bi guman nêzîkî min bû. Destê wê yê di nava destên min de bû, lerizî. Wê hê bêtir xwe sparte min.

Di wê navê de, di ber me re peyayekî ciwan derbas bû. Gava ew hate rasta me, bi carekê ve sekinî, bi dîqet li

rûyê me nihêrî, paşê dîsan çend gavan meşiya. Dilê min wilo lêdixist ku te digot wextî ew ji sînga min bipengize der.

Bi hêdîka,

- Ev peya kî ye, Nastenka? min jê pirsî.

Ew baş nêzîkî min bûbû, mîna hêlkanê dihejiya.

- Ew e... di ber xwe de got.

Ez bi zorê li ser lingên xwe radiwestiyam.

Ji pişt me dengê

- Nastenka! Tu yî, Nastenka? hate bihîstin.

Di eynî demê de ew xort bi çend gavan nêzîkî me bû.

Ew çi qêrîn bû Xwedêyo!... Û lerizîna Nastenka, ji milê min derketin û ber bi mêrik ve bazdana wê! Ez di cihê xwe de şaş mabûm, min li wan dinihêrî. Lê xweavêtina Nastenka ya stûyê mêrik û ber bi min ve vegera wê bû yek. Ez hê berî ku têbigihîjim bê çi dibe, min carekê nihêrî ku milên Nastenka di stûyê min de ne, bi germî û ji dil min maçî dike. Lê paşê bêî ku gotinekê jî bibêje, ber bi yê din ve baz da, bi destê wî girt û ew bi dû xwe de kişand.

Ez di cihê xwe ve sar mam û min li wan nihêrî. Dawiyê herdu jî ji ber çavan winda bûn.

# Sibeh

Şevên min wê sibehê tewaw bûn. Rojeke berbat bû. Baranê bi tipîniyên bi keder li camên pencereyên min dixist. Odeya min tarî bû, li derve hewayeke bi mij hebû. Serê min yê ku ji êşê perçivî bû, gêj dibû. Hemû laşê min bûbû mîna êgir.

Min di navbirekê de li ser serê xwe dengê Matriyonayê bihîst.

- Nameger ji te re nameyek aniye, mîrza.

- Name?... Ji kê?

Ez ji heyecanê pekiyabûm ser lingan.

- Ez nizanim, beg. Ka tu li hundurê wê binihêre, dibe ku tê de nivîsî be.

Min zerf vekir. Ji wê bû.

" Li min bibuhure" digot, " ez têm lingên te tu ê li min bibuhurî. Min hem tu, hem jî xwe xapand. Ev xeyalek bû, xewnerojkek bû. Gava ez îro li te fikirîm, dilê min perçe bû. Li min bibuhure"

" Çi dibe, min sûcdar meke. Ji ber ku ez li hemberî te qet nehatime guhertin. Min ji te re gotibû, ez ji te hez

dikim. Ez ji te hez dikim û ez hîseke ji hezkirinê jî wêdetir di dilê xwe de hildigirim. Xwedêyo! Ku ji destê min bihata û min bikarîba ji we herduyan bi hev re hez bikira... Ma wê çi bibûya, ger tu ew bûya!"

( Ax Nastenka, ma ez qet dikarim van gotinên te ji bîr bikim?)

" Ma min niha nedixwest ku ez ji bo te çi nekim! ez dizanim bê tu di çi rewşê de yî, tu çiqasî li ber dikevî. Min tu şikand. Lê tu dizanî, dilê ku hez dike, şikandina xwe zû ji bîr dike. Tu jî ji min hez dikî. Spas dikim. Ji bo ku te ji min hez kiriye ez spasdarê te me. Ji ber ku ev hezkirina han ji min re mîna gava mirov ji xewneke xweş şiyar dibe û demeke dirêj xweşiya wê xewnê ji bîr nake, di dilê min de cih girtiye. Ji bo ku te ji min re dilê xwe bi biratî vekiriye; te mezinahiya ku tu dilê min ê birîndar û xemgîn qenc bikî û biparêzî nîşanî min da. Lêborîna te, bîranîna bi te re di dilê min de bilindtir dike. Ta ku ez li jiyanê bim, ez ê bîranîna bi te re di dilê xwe de bidim jiyandin. Ez ê wê biparêzim û pê ve girêdayî bimînim. Ew ê tu îxanetê ji min nebîne. Ji ber ku ez îxanetê bi xwe nakim. Te dît, ev dilê ku hê do aydî yekî din bû, ji nişka ve çawan hate guhertin.

Ez ê bixwazim te bibînim; tu ê min terk nekî, tu ê werî. Tu ê her tim bibî hevalê min, birayê min... Gava em hevdu bibînin tu ê destê xwe bidî min, ne wilo? Tu ê destê xwe bidî min û tu ê ji min re bibêjî ku te ez efû kirime. Ma tu hê jî mîna berê ji min hez dikî?

Ax, çi dibe, ji min hez bike, min ji bîr meke. Tu pê nizanî bê ez niha çiqasî ji te hez dikim, dostê min ê delal!

Ez ê hefteya pêşiya me bi wî re bizewicim. Gava ew vegeriyabû, wî hê jî ji min hez dikir, wî qet ez ji bîr neki-

ribûm.

Bibuhure ku min di nameya xwe de behsa wî kiriye. Ez dixwazim bi wî re werim seredana te. Tu ê ji wî hez bikî, ne wilo?

Li min bibuhure, ji bîr meke û hez bike."

Min name careke din û careke din xwend. Çavên min tijî hêsir bûbûn. Dawî dawî name ji destê min ket, min rûyê xwe bi destan nuxumand.

Dîsan dengê Matriyonayê hate bihîstin:

- Ez dixwazim ji te re tiştekî bibêjim, beg!

- Ka bibêje, dayê.

- Min ew tevnepîrikên li zikê odeyê hemû pak kirin. Tu vê firsendê nerevîne, an bizewice, an bangî hevalên xwe bike; tiştekî bike...

Min li Matriyonayê mêze kir. Ez nizanim ji ber çi bû, lê ew pîrejina ku hê li ser xwe bû û ciwan bû, di wê kêlîkê de rûqermiçî, piştxûz, çavçilmisî û pîr xuya dikir. Odeya min jî eynî mîna xizmetkara min kevne dixuya. Dîwar û raxistina alavên li hundur reng avêtibûn. Li her derê tevnepîrik li ba dibûn. Gava min ji pencerê li derve nihêrî, min dît ku xaniyê li hember jî hêrifî ye, mîna ku çilmisî ye, seyandina stûnên wî perçe bi perçe jê de ketiye, xemla stûnan reş bûne û cih bi cih perçivîne. Ew rengê biriqandî yê dîwaran nemabû, dîwar gewr bûbûn.

Gelo ma ji bo ku rojê serê xwe di bin ewrên baranê de nîşan dabû û tavilê winda bûbû, her tişt li ber çavên min wilo bêreng dixuyan?

An jî gelo ma min pêşeroja xwe ya bi hizin û nexweş demekê di xeyala xwe de dabû jiyandin, rewşa xwe ya piştî bi panzdeh salan, dîsan bi tenê, dîsan di eynî odeyê de, digel ku salên dirêj di ser re derbas bûne,

dîsan bi Matriyona ku bi qasî misqalekî biaqil nebûye re bijîm, min dîtibû?

Lê ji te kîn girtin, Nastenka?... Herimandina dilşahiya te ya pak û xweş ?... Ma ez qet bi gazin û lomeyên xwe yên bêtehm te xemgîn dikim û ezabên bi dizî bi te didime kişandin? Ma ez qet dixwazim ku dilê te di rojên te yên herî şa de bi êş lêbikeve? Roja ku tu bibî bûk û bi wî mêrîkî re bimeşî, ma ez dikarim gulekê jî ji wan gulên narîn ku te bi porê xwe yê reş vekirine, biçilmisînim? Ma ez ê van bikim, Nastenka? Qet, qet! Bila asmanê te her tim sayî be, bila bişirînên te yên dilovan şewq û şahiyên xwe winda nekin. Ji dema ku te şahî daye vî dilê min ê ku bi tena xwe dijî û ji bo te bi minetkarî lêdixe, ez ê te her bi qencî bi bîr bînim.

Xwedêyo! Ew çi demeke xweş û dirêj bû! Ma qey demeke wilo ji bo temenê mirovekî têr nake?

# ŞEVÊN SPÎ

## Dostoyevskî

Digel ku ev zêdeyî sed salî ye di ser *Dostoyevskî* re derbas bûye jî, hê ew bi zewq û heyecan tê xwendin, berhemên wî mîna piyes li ser dik û sehneyên cîhanê bi xurtî têne leyistin, ji aliyê temaşevanan ve bi balkêşî têne temaşekirin.

Sedema ku heta niha *Dostoyevskî* aktuelbûna xwe parastiye ew e, ku ew ji peyvên pûç û vala, ji gotinên tûj û sloganî dûr, lê bi gotinên tije mane, mîna psîkologekî jîr dadikeve kûraniya ruhuyeta kesan û dibe şirîkê rebenî û perîşaniya wan.

Di *Şevên Spî* de *Dostoyevskî* perîşanî, şerpezetî, tenêtî, rebenî û evîna du mirovên dilpak; Nastenkaya hivdeh salî û xortekî bîst û şeş salî, bi hostetî tîne ziman.

Weşanxaneya me pirtûkxaneya kurdî kiriye xwediyê vê berhema hêja.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be...